# ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ

## 4

*Ev pirtûk ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê û Qomîteya Zanist û Ronakbiriyê ve, weke pirtûka waneyêhatiye pejirandin.*

# AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

## Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Elî DEMİR, M. Şîrîn ÇETİN, Mazlûm TEKİN, Îsmet YALVAÇ, Hewar GUNGEN, Sedîq BENEK, Hesin DEMİR, Sofî SİDAR, Mihemed KARA

***Ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve qomîsyonek taybet ji nûnerên parçeyên Kurdistanê, ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin.***

## Qomîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Mizgîn EGÎD,Arşek Baravî, Mazlum TEKİN, M. Şîrîn ÇETİN, Birahîm Xelîl, Laleş Ferqînî, Dijwar BOTAN, Ednan HESEN, Mustafa OSMAN, Hisên CIZÎRÎ

## Redaksiyon

**Qomisyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan**

bi alîkariya Bahoz BARAN

## Wênexêziya hinek wêneyan

Muazzez FİLİZ

Cengiz Kara

## Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan

**Bedredîn OY**

**Merwan YAMAN**

*Çapa pêşîn: 1999*

*Çapa Nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





*"Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin."*

# NAVEROK

**BEŞA 1** ........ **9**
GUHDARÎKIRIN ........ 9
SIVORÎ Û ÇÛK ........ 14
*MIJARA SERBEST ........ 16*
RASTIYA MIROVAHIYÊ ........ 16
SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ ........ 18
BIHUŞTA SERZEMÎN ........ 23
GOTINÊN GIRÎNG ........ 26
MÊVANA ŞEVEKÊ ........ 27
*MIJARA SERBEST ........ 30*
ROJA ZAROKÊN CIHANÊ ........ 30
ZIMAN Û ÇAND ........ 31
ALA RENGÎN ........ 34
HEZKIRINA RÊBER APO ........ 37
*MIJARA SERBEST ........ 40*
TEVDÎRA MIŞKAN ........ 40
LAWÊN KURD ........ 41
TESTI. ........ 42
**BEŞA 2** ........ **45**
ŞIVAN ........ 45
ZIMAN Û ÇAND ........ 50
*MIJARA SERBEST ........ 54*
QUTABÎ ........ 54
ZANYARÎ ........ 56
MAMOSTEYA MIN ........ 59
ŞÊR, RÛVÎ Û XEZAL ........ 62
*MIJARA SERBEST ........ 67*
MAMOSTEYÊ LEHENG ........ 67
BÊKÊRIYÊN DARDAROK ........ 68
LI SER WERÎS ARD HATIYE RAXISTIN ........ 72
*MIJARA SERBEST ........ 75*
WERZÎŞ ........ 75
ROJNAMEFIROŞ ........ 77
TESTII. ........ 79

**BEŞA 3** .......... **82**
XEBATA ÇÊKIRINA KELEKÊ .......... 82
ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ .......... 85
NAMEYA JI BO HÊVIYÊ .......... 88
HINDO Û RINDO .......... 92
*MIJARA SERBEST* .......... *96*
DESTANA KAWA .......... 96
MAF .......... 99
GIMGIMOKA BIÇÛK .......... 101
BAJARÊ GORDÎAS, GORDÎON .......... 104
WELATÊ ME .......... 107
KURDISTAN .......... 110
TESTII. .......... 112
**BEŞA 4** .......... **115**
AZADÎ JI ZAROKATIYÊ DEST PÊ DIKE .......... 115
PÎREMÊRD .......... 118
*MIJARA SERBEST* .......... *120*
ROJBÛN .......... 120
BIHARA WELATÊ ME .......... 121
PÊKANÎNA SOZÊ .......... 124
GEŞTA LI PERAVÊN GOLA WANÊ .......... 127
AZADÎ .......... 130
DEHLA ME .......... 133
SELEMÊŞ .......... 135
EVÎNDARA MEZIN .......... 138
ŞÊWAZA AXAFTINÊ .......... 140
HÊVIYA BARANÊ .......... 142
TEST III. .......... 145

# BEŞA 1.

## GUHDARÎKIRIN

Yek ji karê em her roj dikin, guhdarîkirine. Em rojê sê-çar demjimêrên xwe ji vê re vediqetînin. Em li malê guhdarî dê û bav, li dibistanê jî guhdarî heval û mamosteyên xwe dikin. Kurtahî guhdarîkirin di jiyana me ya rojane de cihekî girîng digire.

Guhdarîkirin jî wekî xwendinêye. Dema em dixwînin, em fêrî hest û ramanên kesên din dibin. Heman tiştî em biguhdarîkirinê jî fêr dibin. Bi vî awayî guhdarîkirin destpêka rêya fêrbûnê ye.

Guhdarekî baş bi hedar e. Heta dawî axaftinê dişopîne. Dibe ku bi axaftinan re ne hembîr be. Lê ti caran axaftina axaftvan, nabire. Ger pirsên wî hebin piştî axaftin bi dawî dibe dipirse.



Nirxandina tiştê guhdarkirî karê herî girîng e. Pêwîst e guhdarek baş, baş binirxîne. Mînak; armanca yê taxive çi ye? Şîretan dike yan di derbarê mijareke diyar de, hinek rastiyan vedike? Dema vê dike bi xurûş dibe? Ramanan diguherîne û ji heyîna wan mezintir dike? Nirxandina van pirsan û pirsên wekî van jî karê guhdarekî baş e.



## Wateyên Peyvan

**Şîret:** Amojgarî
**Hembîr:** Hemhizir, hemraman
**Bêjer:** Axiftinker, kesê daxive
**Hedar:**Sebir, aram
**Xurûş:**Kelecan, heyecan

## Em Têbigihin

1- Em di jiyana xwe ya rojane de herî zêde guhdarî kê û çi dikin?
2-Pêwîst e guhdarekî baş kîjan hînbûnan bi dest bixe?
3- Di mijara we xwendî de çend bend hene? Di benda duyemîn ya nivîsînê de çend hevok hene?
4- Encama we ji mijarê derxistiye bêjin. Em ji vê encamê re dibêjin soje (ramana bingehîn)

## Destûrên Ziman

Di benda dawî de, li dawiya çend hevokan nîşana pirsê hatiye danîn? Kîjan peyv û alavan, ev hevok anîne rewşa hevoka pirsyarî? Hinek peyv bi serê xwe dikarin wateyê hilgirin û hevokan saz bikin. Hinek peyv bi serê xwe nikarin wateyê bidin lê di nava hevokan de erkê watedayînê distînin.

*Em ji van peyvên bi vî awayî re dibêjîn **alav.***

Peyvên li jêr ên hatine reşkirin lêkolîn bikin.

Hevalê min **di** malê**de** pirtûkê dixwîne.

Mala hevalê min **li** Dêrsimê ye.

Wek hûn jî dibînin di hevoka yekem de "**di-de**" hatiye reşkirin. "**di**" daçeke û "**de**" jî paşdaçeka wê ye.

Di hevoka duyem de jî daçeka "**li**"yê hatiye reşkirin. "**Li**" daçekeke serbixwe û bê paşdaçek e.

Navên di hevokên jêr de li lênûsa xwe binivîsin.

Em li **mal**ê guhdarî **dê** û **bav**, li **dibistan**ê jî guhdarî **mamoste** û **heval**ên xwe dikin.

Her navek ji van heyînekê didin diyarkirin, navên hevpar yên heyînên ji komekê ne.

*Navên ji bo heyînên ji heman nifşî (cinsî) tên bikaranîn re navên **giştî** tên gotin.*

Navên di hevoka jor de hatine reşkirin navên giştîne.

*Ji wan navên heyînekî bi tenê didin naskirin re navê **taybet** tê gotin.*

Navên di hevokên li jêr de hatine reşkirin navên taybet in.

**Zîlan, Dilvîn, Serdar** û **Şîlan** çûn dibistana **Şehîd KOÇERÎN.**

## HÎNDARÎ

Li ser pirsên li jêr bihizirin û piştre jî bi çend hevokên rêkûpêk bersiva wan bidin.

1- Dema em bi kesên pêşberî xwe re daxivin, divê em li çi tiştî şiyar bin?
2- Her dem rûkenîn çi sûdê dide me?

**AMOJGARÎ**

Dema mamosteyên we nivîsê dixwîne bi balkêşî guhdarî bikin.

- Dema hûn guhdarî dikin, bala xwe nedin tiştên din. Ji bo baş têgihiştina tiştên hûn dixwînin bixebitin.
- Di pêşî de nivîsê bê deng bixwînin. Piştre jî bi deng bixwînin. Bila pileya dengê we di cih de be.
- Axaftina ku rêveberiya dibistana we di deh-pazdeh hûrdeyan de bike, bêyî bala we belav bibe guhdarî bikin.

# SIVORÎ Û ÇÛK



Mala me li cihekî bilind e. Pencereya me li aliyê baxçe yê tena û bi keskatî ye. Dema ez tenê dimînim, li ber pencerê rûdinim,li keskatî, dar û pelçimên di nav bayê de dileyîzin temaşe dikim. Ez bi vî awayî çavên xwe şad dikim. Di vî baxçeyî de dengê hatina çûkan ji me re şadî bû. Sivoriyê bi rengê sor ji darê dihat xwarê û bihilavêtinê li ser çîmenê digeriya. Xwarina li xakê didît, dixist nav lepên xwe û radibû ser lingan.Bi çavên xwe yên biçûk li derdorê dinêrî û xwarina xwe dikirand.
"Ev hemû pêşdariya bêhnvekirina bi xwezayê re ye."

Ez sivoriyan ji nêz ve nas dikim. "Zarokatiya min li herêmeke çiyayî borî." Li wê derê me bi lawiran re dilîst, taybet bi sivoriyan re." Ji ber ku sivorî lawirekî zîrek û nêzî mirov e."

Dema ku mirov lawiran ji nêz ve nas dike, hîn zêde ji xwezayê hes dike û bi xwezayê ve tê girêdan. Lewra lawir xemla xwezayê ne.

## Wateyên Peyvan

**Pêşdarî:**Kevil, tablo
**Tena:**Aramî, bêdengî
**Sivorî:** Sivore, simbore, lawirek kûvî li ser darên weke gûz hwd. Jiyan dike.

## Em Têbigihin

1- Dema nivîskar li mala xwe bi tenê dimîne, bi çi bêhna xwe vedike?
2- Zarokatiya nivîskar li ku derbas bûye?

## Destûrên Ziman

Peyvên di hevokên jêr de bi awayê reş hatî nivîsandin peyvên hevwate ne?

-Bi çavên xwe yên biçûk li derdora xwe **dimeyzand** û xwarina xwe dikirand.

-Bi çavên xwe yên biçûk li derdora xwe **dinêrî** û xwarina xwe dikirand.

*Ew peyvên ku nivîsandina xwe cuda lê heman wateyê didin re peyvên **hevwate** tê gotin.*

## MIJARA SERBEST

## RASTIYA MIROVAHIYÊ

Rojekê, zarokê bi navê Dilgeş, dema li derê mala xwe dilîst, parçeyek cer dibîne. Dilgeş bi vê dîtina parçeyê cer re mereqekî kûr kişand, jiyana mirovên destpêkê di xiyalên xwe de zindî dikir.

Êvarê Dilgeş di xewna xwe de li serdema civaka xwezayî (neolîtîk) dikeve nav goftûgoyeke bêdawî û wiha dibêje:

- Serdema civaka xwezayî, destpêka civakbûna mirovan e. Awayê vê jiyanê ne wek serdema ku ez tê de dijîm, cudahiyeke pir mezin heye. Di vê jiyanê de wekhevî, parvekirin û azadî heye. Di jiyana me de newekhevî, neparvekirin û bê mafî bi bandor e.


Piştî van gotinan, bi Civaka Xwezayî re dikeve nav goftûgoyan.

Civaka Xwezayî:

- Li gel me hesûdî, kîndarî, ezezî nîn e, her kes li gorî derfetên xwe, xwe tevlî jiyana giştî dike. Em tev bi hev hene. Civak tine be, em jî tine ne.

Dilgeş:

- Li ba me ev yek berûvajî ye. Ezezîtî di asteke bilind de ye. Her kes dibêje, ez tune bim, civak jî wê tune be. Hesûdî, kîndarî zêde ye. Her kes xwe bingeh digire û her kes bes ji bo xwe dihizire. Em jî weke zarok di nava vê de pir zoriyan dikîşînin.



Civaka Xwezayî:

- Em bi xwezayê re yekpar in û pîroz lê dinêrin. Ne ji derveyî. xwezayê ne. Bi çavekî dijminatî li xwezayê nanêrin. Em berdewamiya wê ne.

Dilgeş:

- Em xwezayê dijmin û hov dibînin. Dibêjin, pêwîst e em li ser xwezayê desthilatdar bin. Ji bo vê êrîşeke bêsînor li hember xwezayê tê domandin

Civaka Xwezayî:

- Wisa nebêje. Wê xweza tola xwe ji we hilîne. Erê bêdeng tê diyarkirin, wê roj were tola xwe ji we bistîne.

Dilgeş:

- Dera ku ez jê hatime, her roj şer, kuştin tê kirin.

Civaka Xwezayî:

- Li gel me tenê mirin heye. Kes heta niha bi kuştinê nemiriye. Em şer nizanin, fêm nakin. Em bi hev re jiyankirin û danjiyankirinê bingeh digirin.

Li ser vê Dilgeş ji xewê radibe. Sibê zû amadekariya xwe ya çûyîna dibistanê dike. Mamoste di waneya Zanistên Civakî de dabaşa serdema civaka neolîtîkê dike. Dilgeş mijara waneyê û xewna xwe beramberî hev dike.

Dilgeş:

Ji xwe re dibêje; “Nexwe xewna min rastiyek e û min jî dîroka çêbûna mirovahiyê dîtiye.”



# SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ

Di welatekî de çapxaneyek hebû. Desteyên kaxezan di çapxanê de dest bi pesindayînê dikirin. "Ez nebim pirtûkek nayê çapkirin. Ez nebim tû yê li kûderê binivîsî, pênûsa çepel? Ez nebim tû yê bi çi berg bikî?”

Pênûsê: “A rast ez nenivîsim, kaxeza virt û vala wê kêr çi bê?" Piştre bergê pirtûkê tevlî axaftinê bû û wiha gotibû: "Tiştê ku we tîne rewşa kêrhatina kar, heybeta min e."

Xwediyê çapxaneya li jor û nivîskar pev çûbûn. Nivîskar xwe qure dike û dibêje: "Ez rûnenim û pirtûkên delal nenivîsim, hûn ê çi bikin?" Xwediyê çapxaneyê jî li hember nivîskar derdikeve û dibêje: "Ez pirtûkên te çap nekim, wê kî te nas bike! Kî dê ramanên te bixwîne?” Ên li wê derê dixebitin jî tevlî nîqaşan dibin: "Kes me nabîne, em nebin wê kî pirtûkan çap bike?”







Roj hatibû. Her kesên ji hev bêhay, biryara nexebitandinê girtibûn. Vê carê jî yên ji pirtûkan he dikin, dest bi silbûnê kiribûn. Wisa li wan hatibû ku nikarin pirtûkan bibînin û bixwînin.

Di dawiyê de dinêrin ku çênabe, tevayî têkildar tên gel hev, dest bi lêgerîna çareseriyê dikin. Li welatê cîran bapîrê zana yê rihspî hebû. Diçin cem wî û derdê xwe jê re dibêjin. Bapîrê zana yek bi yek guhdariya wan kiribû. Hemûyan, "ez nebim..." gotin û dest bi axaftinê kirin. Bapîrê zana: “Hûn hemû hevdu temam dikin. Bi tena serê xwe kes bi kêrî tiştekî nayê.”

Hemûyan ji kiryarên xwe şerm kirin. Her kes zivirî û dest bi karên xwe yê berê kiribûn.

Kesên ji pirtûkan jî hez dikin digihîjin pirtûkên nû û delal.





## Wateyên Peyvan

**Çepel**: Pîs
**Heybet**: Meznahî
**Qure**: Piş, gij
**Silbûn**: Enirîn, xeyidîn.

## Em Têbigihin

1- Lehengên sereke yên vê mijarê kî ne?
2- Di navbera pênûs û kaxezê de çi derbas bû?
3- Çima yên ji pirtûkan hes dikin dixeyidin?
4- Bapîrê zana amojgariyeke çawa li wan kir? Ev şîreta hatî dayîn dibe sojeya mijarê? Çima?
5- Ev mijar nivîsandina bûyerekê ye. Bûyerên di mijarê de rêz bikin.

## Destûrên Ziman

Di nivîsê de, di derbarê pirtûkê de, pênc peyvan bibînin. Wan li lênûsa xwe binivîsin.

Peyva "***çapxane***" bi kîjan paşgirê bûye peyveke darişti?

*Dema peyvek xwerû, pêvekek sazker bistîne û wateyek nû bi dest bêxe, jêre **peyva darişti** tê gotin.*

Navên taybet ên di mijarê de bibînin. Tîpa destpêka wan navan çawa hatine nivîsîn?

Kîjan peyv, wateya pirsê dide hevokan. "Ez nebim tu yê li kûderê binivîsî, pênûsa çepel?" Kîjan hêma li dawiya hevokê hatiye bikaranîn.

Hevokên pirsyarî yên di mijarê de bibînin û li lênûsa xwe binivîsin. Ji bîr nekin li dawiya wan pirsnîşanê (?) bikar bînin.

## HÎNDARÎ

Kaxez di kîjan dezgehan re derbas dibin û vedigerin pirtûkan? Bi çend hevokan li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ


Nivîsa dest a xwar ya bi tîpên biçûk û mezin li jêr hatine nivîsîn li lênûsa xwe binivîsin. Heta ku hûn rast binivîsin, nivîsîna tîpan bidomînin.

*A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M*
*N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z*

*a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s*
*ş t u û v w x y z*



# BIHUŞTA SERZEMÎN

Ev axe axa mine
Diya giyanê min e
Ji min re kanya jîn e
Ez Mem im ew jî Zîn e

Ez geriyam li welat
Min qet xew nekir yek kat
Xweşiya vê bihuştê
Her kesî dihêle mat

Ez çûme wan zozana
Kêlê û Fereşîna
Delav û Şerefdîna
Tev bingehê evîna

Ser rûyê te girt zemîn
Parçeyek axa şirîn
Rûyek geş û bi evîn
Dikuje di dil de kîn

Darên berû binirx in
Spîndar pir û bilind in
Gûz hêjayên dîtinê
Behîv jî gelek rind in

Çiyayan ez gêj kirim
Pey xwe har û dîn kirim
Parêzvaniya wan jî
Ji xewê şiyar kirim

## Wateyên Peyvan

**Kêla Memê:** Çiya û Zozanek ya li herêma Qileban e.
**Fereşîn:**Zozanek ya li herêma Elkê ye.
**Delav:** Zozanên Berê Deriyan
**Şerefdîn:** Çiya û Zozanek ya di navbera herêma Mûşê û Çewlikê.
**Zemîn:**Erd
**Kîn:**Rik
**Nirx:** biha

## Em Têbigihin

1- Dema hozanvan li welat digere çi tiştên balkêş û xweşik dibîne?
2- Hozanvan girîngiya axê di malika duwem de çawa aniye ziman?
3- Malika sêyan kîjan taybetiyên bihuşta serzemîn dide diyarkirin?
4- Hozanvan ji kîjan taybetiya bihuştê mat dibe?
5- Hozanvan çima ji welatê xwe re gotiye "***Bihuşta Serzemîn***"? Welatê wî li kûderê ye?

## Destûrên Ziman

Ji hevokên li jêr peyvên "**axa, çûme, çiyayan**," hatine derxistin. Van peyvan cardin li cihê wan binivîsin.

***Ev axe ............min e.***

***.......... ez gêj kirim.***

***Ez ............wan zozanan.***

Her peyvek yên li jêr di hevokekê de bi kar bînin.

**"behîv, Fereşîn, gêj."**

Di hevoka "**Darên berû bi nirx in**" de çend navên giştî hene?

## HÎNDARÎ

1- Bedewbûna welatê xwe bi çend hevokan şîrove bikin.

2- Em çima ji welatê xwe hez dikin? Bi nivîskî vekin.

3- Hûn di derbarê Mem û Zînê de çi dizanin? Zanînên xwe bi lêgerînê zêde bikin.

4- Li ferhengoka xwe binêrin ka çi wateya "mat" heye? Ev peyv li kûderê tê bikaranîn?

## GOTINÊN GIRÎNG


- **Di xwezayê de ti heyîn bê wate nînin.**
- **Xwe naskirin bingehê hemû zanistan e.**
- **Ta wekhevî û azadiya bi jinê re çênebe, azadî û wekheviya civakê çênabe.**
- **Pêxemberî; serokatiya mezin ya civakê ye.**

*RÊBER APO*



# MÊVANA ŞEVEKÊ

Şeveke payîzê ez zû vegeriyabûm malê. Piştî min destên xwe şûştin, çûm hundirê pêjgehê. Min ronahî pêxist. Di paceya pêjgehê de reşek diliviya. Ez nêzîk bûm û min lê nêrî. Kevokek di valahiya pêşiya pacê de bi cih bûbû. Dema ez dîtim, çengên xwe livand û cihê xwe xweştir kir. Diyar dikir ku nexweş e; dibe ku ji ber seqetiya xwe nikaribû bifire û ji bo ewlekariya xwe ev der hilbijartiye.



Di carekê de ez tê giham mêvan ji paca me re hatibû. Ji êşê zêdetir di çavên wê de westabûnê xuya dikir. Biryar dabû ku şeva xwe li wê derê derbas bike. Ji ber ku pir westiyabû.
Ji bo ku neêşe, min ronahî temirand.

Piştî bîsteke din pevjîna min hat. Min jê re got: "Îşev mêvaneke me heye." Çav li hundir gerand. Dema kes nedît pirs kir: "Ka?" Min ew bir pêjgehê. Min pace şanî wê kir. Mêvana me amadekariya raketin dikir.

Wê şevê em herdu jî li ser xwarinê kêfxweş bûn. Dema em zarok bûn ji dibistanê vedigeriyan em bi mêvanekî şevê re bihatina pêşberî hev, em çiqas kêfxweş dibûn, me ew bibîr anî.
Ji bo ku mêvana me aciz nebe me gengeşe nedikir. Me cûre kir ku dema bibe sibeh em ê pencerê vekin; birinç û parçeyên nan bidin mêvana xwe. Roja din sibê zû ez ji xewê rabûm, bezîm pêjgehê. Lê hinek pirtik mabûn li cihê mêvana me ya şevê mabûn. Ez hizirîm ku, "ji min zûtir rabûye û çûye."

## Wateyên Peyvan

**Pêjgeh**: Aşxane, pêjge Cihê çêkirina xwarinan.

## Em Têbigihin

1- Di vê bîranînê de bi rêzê ve kîjan bûyer derbas dibin?
2- Hatina kevokê ya ber pacê li ku dera mijarê tê têgihandin?
3- Nivîskar û pevjîna xwe nêzîkatiyek çawa li kevokê kirin?

## Destûrên Ziman

Li şûna peyvên di hevokên jêr de hatine reşkirin bi wateyên dijber binivîsin. Van hevokên nû li lênûsa xwe binivîsin.

- Şeveke payîzê ez **zû** vegeriyabûm malê.

- Piştî min destên xwe şûştin ez çûm **hundirê** pêjgehê.

Di wateya hevokan de guhertineke çawa çêbû?

*Peyvên ku ji aliyê wateyê ve dijberî hev bin jê re **peyvêndijwate** tê gotin.*

Em kîjan peyvê li şûna peyva "***kevokek***"ê ya di hevoka "***Kevokek** di valehiya pêşiya pacê de bi cih bibû.*"de bikar bînîn wateya hevokê nayê guhertin.

Ji peyvên wateya wan wekhev re çi tê gotin?

Di benda destpêka nivîsê de çend hevok hene? Li dawiya wan hevokan kîjan hêma hatine bikaranîn?

## HÎNDARÎ

Nivîskar di mijarê de li pêşiya hatina kevokê ya li pêşiya paceya vekirî bi vî awayî dest bi nivîsînê kiriye.

Bi danûstandina xwe û pevjîna xwe ya bi kevokê re nivîsîna xwe bi pêş xistiye. Bi bendekî çûyîna kevokê ji malê. Mijara xwe bi encam dike. Hûn jî mijarekî li gorî plana li jêr binivîsin.

- Di beşa destpêkê de bîranîna we bi kîjan lawirê re têkildar e, bûyer li kûderê û çawa dest pê kiriye diyar bikin.
- Di beşa naverokê de têkiliya xwe û lawiran vekin.
- Di beşa encamê de jî bûyer çawa bi dawî dibe û bandorên ku li ser we hiştine, diyar bikin.

## MIJARA SERBEST

# ROJA ZAROKÊN CIHANÊ

Cejna zarokên cîhan,
Ji mafê me ye dîlan,
Em jî bi kêf û şadî,
Tevde bêjin azadî.

Lê mixabin sed carî,
Jiyana me reştarî,
Ya heval û hogiran,
Bihar li wan dibarî.

Kurd ne hov û bela ne,
Em jî zarokên wan e,
Daxwaza me aştî ye,
Çima bi we giran e.

Gelî zarokên cîhan,
Bîst û pêncê Cehzeran,
Cejna me mindala ye,
Ji bil zarokên Kurdan.

Mafê me jî azadî,
Bi cejin û kêf û şadî,
Bi yarî û nû cil bin,
Bilind bankin azadî.

Armanca me aşitî,
Heskirin û biratî,
Gunehê me çi heye,
Kîn û pevçûn hilatî.



# ZIMAN Û ÇAND

Ziman têgeha ramanî ya çandê ye. Mirov hestên xwe, hizirînên xwe û pêwistiyên xwe bi ziman rave dike. Ji ber vê çendê bi karanîna ziman di pêşkeftina civakan de cihekî girîng digire.

Civakek, bi parastin û pêşxistina zimanê xwe, hebûna xwe dide diyarkirin. Hatina civakan ya heya roja îro, girêdayî pêkanîn û pêşketina ziman e. Ziman têgehên çandê ji nifşekî radigihîne nifşekî din. Mirovê ku karî zimanê xwe bikarbîne, nivîsandin jî di nav de ew xwedî pêşerojek ronî ye. Ziman, çandê ji nifşekî radigihîne nifşekî din. Cihê ku ziman û hizirîn di nav de ye, cihê ku herî bi asanî dewlemendiya çandê lê tê dîtine. Çand bi xwe bi awayekî herî berfireh pênasekirina ziman û hizirê ye û ziman hîmê bingehîn yê civakê ye.

Mirov, hemû çêkerên xwe bi hizrinê dafirine. Di hemû destkeftiyên ku afirandî de, vedana hizrê wan tê dîtin. Belkû civakek yan jî her komek din ku li gorî zihinyeta xwe hemû afirandina negihînê dawîbûnê lê ew kom yan jî civak, di ziman û hizirê xwe yê dîroka derbasbûyî de hemû destkeftiyên ku afirandî li dewsa wê dihilgire.

Ziman, nasnameya civak û çandê ye. Ziman girîngiya têkiliya mirovên di civakê de dide zanîn û zindî dike.



## Wateyên Peyvan

**Hîm:** esas, bingeh

## Em Têbigihin

1- Ziman çi ye?
2- Têkîliya di nava çandê û ziman de çi ye?
3- Sojeya mijarê çi ye?

## Destûrên Ziman

1-Peyvên wek "Rêber Apo, Dîlok, Ruha, Mereş" navên taybet in. Tîpên destpêka peyvan çawa hatine nivîsîn?
Van navên taybet bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.
2- Di nivîsandinê de sê navên giştî bibînin û li lênûsa xwe binivîsin. Çi cudahî di navbera nivîsandina navên taybet û navên giştî de hene?
3- Sergotara mijarê ji çend peyvan pêk hatiye?
*Em ji encama ku ji mijareke tevayî hatî derxistin re dibêjin **soje**.*

## HÎNDARÎ

**1-** Zimanê Kurdî yê di bin çewsandin û zorê de, pêşketina xwe didomîne, xwediyê çi taybetmendiyaye?

**2-** Rêber APO, çima giringiyê dide ziman, wêje û çanda Kurdî?

**3-** Di avakirina çanda giştî de çi rista ziman heye?

# ALA RENGÎN



Ala rengîn tu pir şîrîn,
Xoştivî, kesk, sor û zerîn,
Li ser xakê xwe bihejîn,
Ji bo gel tû bibî mizgîn.

Hezar sal e li benda te,
Çav maye li hejana te,
Me xwîn rijand ji bona te,
Bê te xak qet ne welat e.

Ala rengîn heja pêl pêl,
Bo te gorî ev gel û êl,
Tê bihejî li her çar hêl,
Bi sirûdan te bikin kêl.

Li cîhanê nava ala,
Tê bihejî meh û sala,
Di nav gel de hemû mala,
Nav ciwanan li ser mila.

Te nahêlin ey ala rind,
Li her derê tu yî bilind,
Li her cihî bajar û gund,
Her nazdar be qet nebe tund.

Ji bo te bi peyman û soz,
Te bilindkin cejn û Newroz,
Ji bo te ye ev xwîn û doz,
Xwedî pakrewanên pîroz.

## Wateyên Peyvan

**Xoştivî:** Heskirî
**Sirûd:**Merş
**Xak:**Erd
**Tund:**Hişk
**Pakrewan:**Şehîd, giyanê paqij

## Destûrên Ziman

1- Di sirûdê de çend malik hene?
2- Di her rêzekê de çend kite hene?
3- Li dawiya rêzan, di navbera kîjan peyvan de wekheviya deng tê dîtin?
4- Hûn ji gotina "***Bê te xak qet ne welat e.***" çi fêr dibin?
5- Helbestvan çima dibêje “Ji bo te bi peyman û soz, te bilind bikin cejn û Newroz.”

## Em Têbigihin

Sirûd beşekî muzîkê ye. Bi muzîk û naveroka xwe ji helbestan cuda dibe. Cihê lê tê bikaranîn, ji helbestê cuda ye. Sirûd, netewî ne û di rojên pîroz û taybet de tên gotin.

Di helbestê de gelek navên mîna **"al, welat..."** hatine nivîsîn hene, bêyî ku wateya wan xira bibe nayên kurtkirin re dibêjin **navên xwerû**.

Di malika dawî de raveka hevalnavan ***"pakrewanên pîroz"*** derbas dibe. Bi pêveka "**ên**" raveber bûye **pirjimar**.


## HÎNDARÎ

Di refê de, ji xort û keçan du koman ava bikin. Di bin rêveberiya mamoste de bi awayekî keç û xort, bi rêzê ve malikan bixwînin.

Li jêr hevoka destpêka bendekî heye. Li pey vê hevokê, çar-pênc hevokên parastin û girîngiya alê têdigihînin binivîsin.

**“Ala me nûnertiya netewa me dike.”**

# HEZKIRINA RÊBER APO

Rêber Apo ji gelê xwe pir hes dike û jê re rêzdar e. Mînakekî vê heskirinê em bi hev re guhdarî bikin:

"Em dozdeh kes ji Bakurê Kurdistanê çûn serdana Rêber Apo. Dema em gihîştin cihê Rêber lê dima, em dihizirîn ka em ê çawa bibînin. Hêj me çayek venexwaribû, me dît, ket hundir û bixêrhatina me kir. Bi xurûş me pêşwaziya wî kir. Wî yek bi yek em hembêz kirin. Roja din, danê nîvro bi me re xwarin xwar. Li ser xwarinê hem pirsa me û gel dikir hem bi destê xwe goştê li ser xwarinê parçe dikir û datanî ber me.

Rêber Apo, gelek kêfxweş, ji her kesî dilnizmtir bû. Di danûstandinê de, ji her kesî nêzîktir bû. Bes di zanîn, nirxandin û naskirina mirovan de ji her kesî zanatir bû.

Rêber Apo, bi gel re gelek wêne dikşandin û hemû cûrên axaftinê dikir. Dema kesên ji gel rêwî dikirin, bi dilekî germ, bi rûyekî geş, li gel wan heta ber tirampêlê dihat, li wê derê radiwesta, destê xwe li wan dihejand û heta ku ji ber çavên wî winda dibûn."

## Wateyên Peyvan

**Pêşwazîkirin**: Çûna pêşiyê ve
**Hembêz:** bermilkirin

## Em Têbigihin

1- Rêber APO çawa nêzîkî mêvanên xwe dibû?
2- Di mijarê de Rêber APO çawa hatiye nasandin?
3- Kesên ji cem Rêber APO diçûn çawa dihatin rêwîkirin?

## Destûrên Ziman

1-Di hevoka jêr de çend kite hene?
Rêber ji gelê xwe pir hes dike.
2-Di her kiteyekê de çend tîpên dengdêr û çend tîpên dengdar hene?
Elfabeya me ji **"8"** tîpên dengdêr û **"23"** tîpên dengdar pêk tê.

Di nav tîpên dengdêr de dengê tîpên ***"a,ê,î,o,û"*** dirêj in. *Ji ber wê em ji wan re dibêjin* ***dengdêrên dengdirêj.***
*Di nav tîpên dengdêr de dengê tîpên* ***"e,i,u"*** *kurt in. Ji ber wê em ji wan re dibêjin* ***dengdêrên dengkurt.***

Wek hûn jî dibînin tîpên dengdêr bi serê xwe deng derdixin, bi serê xwe dibin kite. Yên dengdar bi dengdêran tên bilêvkirin.

## HÎNDARÎ

1- Mijara we xwendî bi kurtahî binivîsin.
2- Di vê mijarê de, em kîjan taybetmendiyên Rêber APO dibînin?
3- Bîranîneke Rêbertiyê ku hûn dizanin di refê de parve bikin.
4- Hinek taybetmendiyên Rêber APO, li lênûsa xwe binivîsin.

# MIJARA SERBEST



## TEVDÎRA MIŞKAN

Li welatê Mêrdînê
Di nav gundê Cilînê
Pisîkekî xurt û şeng
Bûbû xudan nav û deng
Mişk nehiştin di malan
Giş revîn qul û çalan
Kîjanê wan dihat der
Pisîk xwe zû davêt ser
Welê mabûn mat û gêj
Yekî wan î boçdirêj
Digot: Gelê hevalan
Em girtî man di çalan
Rêkê bo me çar bikin
An jî ji vir bar bikin
Mişk neman tev dicivîn
Bo vê yekê peyivîn
Her yekî yek digotin
Kezeb ji xwe disotin
Yekî wan î rîsipî
Digot: Ev e min rê dî
Du zengilan bibînin
Bidin yekî bişînin
Heke li ku pisîk dî
Bila têxe situyê wî
Çi gav dengê zengil bê

Wer zanibin ku ew tê
Bi lez û bez veşêrin
Nema hûn kes dimirin
Gişkan digot: Welê ye!
Ev tevdîreke li rê ye
Lê di nav xwe kes nedîn
Ku wî karî biqedîn
Pisîk serbest hiliştin
Wî jî her ew dikuştin.

**Osman Sebrî**




# LAWÊN KURD

*Kurd im lawên Kurdan im*
*Xwedî çand û ziman im*

*Kurd im keça Kurdan im*
*Bihuşt im Kurdistan im*

*Mirovê aştîxwaz im*
*Mafê gelan dixwazim…*

*Zana û xwendevan im*
*Kurd im ji Kurdistan im*



# TESTI.

## ÇÛKA ÇENGŞKESTÎ

*Ez li çavên wê yên morikî yên reş dinêrim. Rexên wan sorik in. Wekî bihizire. Ma çûk dihizirin? Bawer bike ev dihizire. Dibe ku ji ber êşkişandinê wiha xuya bike. Min li rex dara biya mezin a li ber aş dît. Çengên xwe dixişikand û dixwest bifire, lê bê hêz, Çengşor e. Her bêhnekê, nikilê wê yê dirêj vedibû û dihat girtin. Dilê wê yê biçûk di destê min de tip tip bi lez davêt. Min digot wê jiyana xwe ji dest bide. Ji ber wê dilê min direcifî...*

*Her sê pirsên destpêkê li gorî mijarê bersiv bidin.*

**1- Mijara di vê nivîsînê de li ser tê rawestîn kîjan ji yên li jêr e?**

**a)** Hezkirina çûkê.
**b)** Hezkirina xwezayê.
**c)** Şadiya hewaya vekirî.
**d)** Bêrîkirina firînê.

**2- Em nikarin kîjan gotina li jêr şûna gotina "*Dilê min direcifî*" ya di mijarê de bikarbînîn?**

**a**) Ez di gumanan de me.
**c)** Gelek bêzar dibim.
**b)** Gelek ditirsim.

**3- Kîjan peyva di hevoka "Her bêhnekê, nikilê wê yê dirêj vedibû û dihat girtin" de hevalnav e?**

**a)** Bêhnekê **b)** Nikilê **c)** Dirêj **d)** Girtin

**4- Hûn ji beşa "*naverok*"ê ya pirtûkan çi fêr dibin?**

**a**) Peyvên ku em wateya wan nizanin.

**b)** Çawa peyv tên nivîsîn.

**c)**Xwendina mijaran.

**d)** Mijarên di pirtûkê de, di kîjan rûpelan de cih digirin.

**5- Kîjan ên li jêr ne li gorî rêza tîpan tên rêkûpêkirin?**

**a)** Pirtûka waneyan.

**b**)Ansîklopedî.

**c)** Ferhengoka li dawiya pirtûkên waneyan.

**d)** Ferheng.

**6- Nivîsandina kîjan peyva li jêr çewt e?**

**a)** Pir **b)** Çal **c)** Pirtek **d**) Ar

**7- Wateya biwêja "*guh dabû*" di wateya kîjan vebijêrkên li jêr de ye?**

**a)** Bêgirîngî guhdarîkirin.

**b)** Wekî guhdaran hatî dîtin.

**c)** Bi mereq û balkêşî guhdarîkirin.

**d)** Xwe guhdar dide nîşandan.

**8- Di kîjan hevoka jêr de daçeka serbixwe hatiye bikaranîn?**

**a)** Ez çûm dibistanê.

**b)** Mala me li Amedê ye.

**c)**Mamosteyê min hêja ye.

**d**) Min pirtûk xwend.

**9- Wateya kîjan peyva li jêr, ji yên din cuda ye?**

**a)** Desthilatdarî

**b**) Serdestî

**c)** Xweserî

**d)** Nijatperestî

**10-Nîşana pirsê nakeve dawiya kîjan hevoka li jêr?**

**a**) Wî ji min re çi hevaltî kir.
**b)** We ji bo azadiya xwe çi kir.
**c)** Hûn çima naçin dibistanê.
**d)** Roja me Rêber Apo ye.

**11- "Me sarbûnên wiha xirab, ji beriya niha sê salan jiyan kiribûn." Em li şûna peyva "beriya" kîjan peyva li jêr bikar bînin wateya hevokê nayê guhertin?**

**a)** Piştre **b**) Niha **c)** Pêşiya **d**) Dahatû

**12- Di kîjan hevoka jêr de tenê navê giştî heye?**

**a)** Bajar, deşt û çiya man di bin berfê de.
**b**)Firat û Dîjle dem deman diqerisin.
**c)** Lehiyê da ser Heskîfê.
**d)** Li Mexmûr jî germahî şikest.

**13- "*Wê malekê li nêzîkî dibistanê bigire*." Di vê hevokê de peyva dijberî peyva "nêzîk" di kîjan hevoka jêr de hatiye bikaranîn?**


**a)** Ji dibistanê re hinek maye.
**b)** Demeke dirêj ji bo bêhndanê maye.
**c)** Tu hinekî li benda min bimînî em ê, hev bibînin.
**d)** Li dûrî dayîka xwe rûdine.

**14- Di kîjan hevoka jêr de navê pirjimar heye?**

**a)** Ref xwe amadeyî waneyê dike.
**b)** Wê rojê hevalê min nehatibû.
**c**) Daran pelên xwe werandin.
**d**) Sibehê li taxa me xurûşek hebû.

# BEŞA 2

## ŞIVAN



Têm û diçim deşt û şax,
Derbas dikim dem û çax.
Ber sêber û helava,
Ser nefel û berava.
Car nizar û car pesar,
Mêrg û çîmen, avên sar.
Dîmen geş in seranser,
Û spî û kesk û zer.
Tev dar û gul û giya,
Wek bihuşt in ev çiya.
Bilbil û kew dixwînin,
Xemên dil direvînin.
Seyê min tim şiyar e,
Neyarê gurê har e.
Nêrî kever pêşeng e,
Zengil biqîr û deng e.
Ku pezê min dibûrê,
Ez pif dikim bilûrê.
Ev karê min xebat e,
Ji bo min û welat e.

***Sebrî BOTANÎ***

## Wateyên Peyvan

**Çax**: Dem, wext, kat
**Helav:**Lîlav
**Sêber:** Sîber
**Nefel:** Giyayekî sê pel û bi kulîlk e.
**Nizar:** Pala ber sih
**Pesar:** Erda paldayî
**Dîmen**: (menzer), Dîtinên awêna

## Em Têbigihin

1- Li gorî helbestvan çiya çawa ye?
2- Hûn çi encamekî ji vê helbestê derdixin?
3- Hûn ji hevoka "*Dîmen geş in, seranser*"çi wateyê derdixin?

## Destûrên Ziman

1- "**Dîmen, şax, mêrg, nizar, welat, ez**" Van peyvan li gorî rêzetîpan binivîsin.
2- "**Daran, çiyayên, lênûsên, hevalan**" Ev peyvên hatine diyarkirin, ji yekê zêdetir heyînan diyar dikin. Di zimanê Kurdî de pêvekên "**an, ên**" li ser koka navan tên zêdekirin û bi vî awayî rewşa peyvê tê guhertin.

## HÎNDARÎ

1- Ji bo ku em bibin mirovên welatparêz, pêwîst e em çi bikin?
Di refê de goftûgo bikin.
2- Di dema goftûgoyê de li gorî van destûran tev bigerin:

- Bê ku hûn mafê axaftinê bistînin ne axivin.
- Nêrîna xwe kurt û vekirî bibêjin.
- Dernekevin derveyî mijarê.
- Bêjer bi balkêşî guhdarî bikin.
- Pêwîst e hûn hevalên xwe yên mîna we nahizirin, bi rexneyên roxîner nekin. Rexneyên erênî bikin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Destpêkê nivîsandina li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin. Paşê gotinên pêşiyan bi dest bixin û bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin.

***Hûn dixwazin nivîsînê bi nîgarî bixemilînin?***

Hevparvekirin

Hevparvekirin taybetmendiyek yê civaka xwezayî ye. Li vê derê komcivîn yan jî li ser amêran û berheman zêde kirin tineye. Xwediyê vê pergalê jine. Ji ber ku di xwezaya jinê de parvekirin heye





## *GOTINÊN PÊŞIYAN*

***Xeta xwehr ji gayê pîr tê.***

***Dar hêj ter tê çemandin.***

***Kevirê giran li cihê xwe baş e.***

***Aqilê sivik barê giran.***

***Geliyê kûr bê avnabe.***



# ÇAND Û ZIMAN

Ji bo naskirina gelan huner cihekî girîng digire.

Dema ku huner tê gotin; wênekêşî, peykertiraşî, avahîsazî, hunerên xemilandinê, şano, muzîk û wêje tê bîra mirov. Wêneyek, peykerek, avahiyek, awazek, romanek, serpêhatiyek di mirovan de hestên ciwan şiyar dikin. Her wiha di hemû deman de jî, ji bo hunerên ciwan girîngiyek mezin hatiye nîşandan. Girêdayî vê, hunerên ciwan ji bo naskirina gelan risteke (rolek) girîng dilîzin.




Rêber Apo jî, ji bo ku hunerên ciwan li hemû deverên Kurdistanê bide pêşxistin; girîngiyek taybet daye hunermendan. Ji bo pêşxistina hunerê perwerdeyek bêhempa afirand û ‘Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê kir kaniya hunermendan. Rêzgirtina hunermendan erkê me hemûyan e.


Şanogeriya Kurdî bi gelek rengan pêş dikeve.

Di hunera Kurdî de gelek tiştên dişibin hev tên dîtin. Ev şibandin mîna dengbêjî, govend û lîstinên bêpeyv in (pandomîm)

Rêber APO, ji bo pêşxistina çand û hunera Kurdî gelek nirxandin kirine û navendên wekî **HUNERKOM, Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM), TEV/ÇAND** û hwd. dane avakirin. Em bi wê pêşketina lîstinên li ser dikê, deyndarê Rêber Apo ne. Rêber APO bangawaziyek wiha li hunermendan kiriye: "Ez we tevan teqdîr (şayeşan) dikim. Xizmeta we ya herî mezin ji bo welat ew e, hûn çand û hunera Kurdî li hemû aliyên welat bidin pêşxistin. Şoreşa me şoreşek hunerî ye."









## Wateyên Peyvan

**Wênekêş:** Kesê karê hunerê wêneyan dike.
**Awaz:** Awayê dengên ku di nav destûrên diyar de tên stran .

## Em Têbigihin

1- Di mijara we xwendî de navên kîjan huneran derbas dibin?
2- Ji bo naskirina gelan çi rista hunerê heye?
3- Hûn ji kîjan peyva Rêber Apo dizanîn ku girîngiyê dide huner û hunermendan?
4- Rêber Apo bi çi awayî pêşengiyê ji bo çand û hunera Kurdî dike?

## Destûrên Ziman

1- Di hevokên jêr de daçek û paşdaçekên xwar hatine nivîsîn lêkolîn bikin.

Ji ber vê, ***di*** hemû deman ***de***,***ji*** hunerê ***re*** girîngî hatiye nîşandan.

Rêber Apo bangewaziyeke wiha ***ji*** hunermendan ***re*** kiriye.

Di zimanê me de sê daçekên cot û yek jî serbixwe heye.

**“di-de, bi-ve, ji-re, li”**

2- Li paşgirên ku li ser peyvên li jêr hatine nivîsîn binêrin

Huner + mend =Hunermend

Dar + istan = Daristan

Ga + van = Gavan

Li jor peyvên nû hatine sazkirin.

Hûn dibînin bi paşgirên "**mend, stan, van**" peyvên nû dane sazkirin. *Em ji wan re dibêjin* ***paşgirên sazker***.

## HÎNDARÎ

**1-** Di mijara we xwendî de tiştê hûn fêr bûne, bi çend hevokan li lênûsa xwe binivîsin.

**2-** Çima pêwîst e, em rêzê ji hunermendan re bigirin?

# MIJARA SERBEST

## QUTABÎ

Ême qutabî jîrîn
Xawenî hoş û bîrîn
Şagirdê rîyê rûnakîn
Wêneyî berzî û dilpakîn
Xamew kitêb û defter
Hersê dexeyne serser
Pê fêrdebîn zanîstî
Rewiştî ciwan û rastî
Mamostaye raberman
Fermanî li ser serman
Êtir debê bixwênîn
Nezanîn lebin bênîn

***Mihemed Daryas***



## Wateyên Peyvan

**Qutabî**: Xwendekar, xwendevan
**Xawen:** Xudan
**Ronak:** Ronî
**Berz:** Bilind
**Xame:** Pênûs
**Raberman:** Li pêşberî me.

## Helbest Bi Zaravayê Kurmancî

Em xwendekarên jîr in
Xudanê hiş û bîr in
Şargirtê rêya ronî ne
Wêneyê bilind û dilpak in
Pênûs, pirtûk û lênûs
Hersê têxine serser
Pê fêr dibin zanîstî
Reftarê ciwan û rastî
Mamoste ye li pêşberî me
Fermana wî li ser serê me
Êdî divê bixwînin
Nezanînê bin bixin

## ZANYARÎ

Hûn jî dikarin bibin mirovên zanyar. Dibe ku we xwendibe. Çawa ku Krîstof Kolomb û Byrd (Bord) gelek cih dîtine. Gelek cihên nû dîtine. Li wan waran gelek xweşî û nexweşî derbas kirine. Hûn dikarin bi vî awayî bihizirin; "*Ez qet nabim wek vanmirovan?*" Ji xwe di cîhanê de herêmeke nehatiye vedîtin, nemaye.

Rast e mirovan ji zû ve xwe gihandine asta herî bilind. Li gel vê jî hûn dikarin gelek tiştan bibînin. Îro zanyar li şûna cihên nû vedîtine, tiştên nû dafirînin. Ev dîtin û destkeftiyên nû, wekî dîtina cihên nû girîng e.

Em çawa dikarin vîtamînên pêwîst di nava xwarinên cuda de bibînin? Em bi çi awayî ji tîrêj û ronahiya rojê sûd bigirin? Gelo cîhanên wek cîhana me hene, yan na?





Gelek girêftarên wek wan li benda çareseriya zanyaran mane. Em bihizirin ku hûn dixwazin bibin zanyar. Hûn dixwazin vedîtinan bikin. Hûn ji taqîkirinan (ceribandinan) pir hez dikin. Beriya ku hûn biryara xwe ya dawî ji bo karê zanyariyê bidin; pênc pirsên hûn ji xwe bikin hene. Ew pirs jî ev in:

Gelo ez ji karkirinê gelekî hez dikim?

Gelo ez bi hedar im yan na?

Gelo ez hestiyar û baldar im yan na?

Gelo ez xwediyê ramaneke vekirî me yan na?

Gelo ez dikarim rast bihizirim û bi wijadan tevbigerim yan na?

Heke hûn dikarin ji van pirsan hemûyan re bêjin "belê!" sibê dikarin bibin pêşengên zanyariyê.



## Wateyên Peyvan

**Byrd (Bord ):** Kesê ku li cemsera Başûr lêgerîn û lêkolînên girîng kiriye. (1888-1957 li Emerîka jiyaye.)
**Krîstof Kolomb:** Kesek Portekîzî ye ku di salên 1450-1506'an de jiyaye, di sala 1492'an de ji Portekîzê derbasî Emerîkayê dibe

.

## Em Têbigihin

1- Krîstof Kolomb û Byrd di kîjan hêlan de kar kirine?
2- Kesê ku bixwaze bibe zanyar pêwîst e, kîjan pirsan ji xwe bike?
3- Ji çavkaniyekê fêr bibin, telefon kengî û çawa hatiye afirandin?

## Destûrên Ziman

1- Di hevokên jêr de kîjan peyv pirsê diyar dikin?
Gelo hûn ji karkirinê hez dikin?
Gelo ez bi hedar im yan na?
2- Daçekên di hevokên jêr de diyar bikin.
-Wan di mal de pirtûk xwend.
-Me li gel hevalên xwe pirtûk anîn.

## HÎNDARÎ

1- Dema em bi telefonê daxivin pêwîst e bi rêzê ve çi bêjin?
2- Hûn çi sûdê ji telefonê digirin?

# MAMOSTEYA MIN

Hem ew dê ye hem jî bav e
Bê mûç e û bê dirav e
Bi rojbaş dike silav e
Bi rûkenî dike rave

Tû bê mirinî her dijî
Lewma te dagirtî mejî
Ji çand û wêjeyê tijî
Êdî çewtî nema dijî

Mamosteya min a delal
Bi wî zarê şîrîn zelal
Zanîn bo min kiriye mal
Ji bo xwe kirime heval

Mamosteya xwedî raman
Şev û rojê westan nezan
Dixebite bi merg û can
Mirov jê re dibe heyran

**M. Elî**



Ş. Viyan **Demir**



**Ş. Viyan Amara**

## Wateyên Peyvan

**Delal**: Xweşik
**Zarê şirîn**: Zimanê xweş
**Raman**: Hizir
**Heyran**: Pir jê hezkirin
**Mûçe**: Ratib, meaş

## Em Têbigihin

1- Di helbestê de mamoste bi çi awayî tê ziman?
2- Ji hevoka "Êdî çewtî nema dijî" hûn çi fêr dibin?
3- Bi xwendina vê helbestê re hestek çawa bi we re pêş dikeve?

## Destûrên Ziman

1- Peyva **"dixebite"** ya di malika çarem de, em jê re dibêjin **kar**. Lewra peyva **"xebitî"** karê hatiye kirin, diyar dike.

*Ji wan peyvên di hevokan de kirinê diyar dikin re em dibêjin **kar***

*Ji wan peyvên di hevokê de kar dikin re, dibêjin **kirek**.*

2- Van herdu hevokên li jêr bixwînin û kirek û karên wan diyar bikin.

Mamoste waneyê dide.
Azad pirtûkê dixwîne.

## HÎNDARÎ

1- We roja mamosteyên xwe çawa pîroz kir? Bi çend hevokan bîne zimna.

2- **"Mamoste weke findekê, tîrêjê dide hinekên din"** Hûn ji van gotinan çi fêr dibin?

**3-** Helbestekî li ser mamoste hatî nivîsandin bibînin; helbestê ji ber bikin û li pêşberî refê bixwînin.

Dema hûn helbestê ji mamoste guhdarî dikin, li van xalan baldar bin:

- Mirov li kûderê gelek, li kûdera hindik radiweste?
- Mirov li kûderê dengê xwe gelek bilind û li kûderê dengê xwe kêm dike?

-Li van xalan baldar bin û li xweş xwendina helbestê bigerin.

# ŞÊR, RÛVÎ Û XEZAL

Şêr gelek nexweş bibû; çûbû di şikeftekê de razabû. Rûvî jî gazî kir cem xwe, ji bo ku dostaniyê bike û got:

- Eger tû başbûna min bixwazî, tu yê xezala di daristanê de bixapînî. Ez dixwazim dil û mêlaka wê bixwim. Rûvî di cih de xwe berda nava daristanê û xezalek dît. Ji bo wê got:

- Paşayê me şêr, niha gelek nexweş e. Hêviyên xwe, ji bo rabûnê birîne. Biryar girtiye ku paşatiya xwe bide te.



Xezalê bawer kir, ket pey rûvî û berê xwe dan şkeftê û çûn şêr li ber deriyê şikeftê rawestayî bû. Di cih de xwe avêt li ser pişta xezalê, girt û tenê guhê wê pîçekê xwîn kir û berda. Xezal revî, çû daristanê û xwe veşart. Li ser vê rûvî gelek bêzar bû. Hirêna şêrî ji cerg û hinavan dihat. Şêrî disa ji rûvî gelek hêvîkir û got:
- Rêyekê bibîne disa wê xezalê ji min re bîne. Rûvî got:

- Ma xapandina xezalê wisan hêsanî ye lê disa ez ê taqî bikim. Rûvî, xezal di nava daristanê de dît û çû pêşiyê; pirça xezalê qij bû.

- Hey bêxîretê bêxîret, tû here rûvîtiya xwe nîşanî hinekên din bike. Rûvî bi gotinên wê naweste.

- Şêr, hema wisa nexweşiyê paşatiya xwe di holê de navêje. Tû jî ji ber nexweşiya xermişka ku şêr li guhê te dayî ciniqî! Rûvî dîsa xezal xapand û bir şkeftê. Şêr hestî û goştê xezalê bi xweşitî xwar. Rûvî jî ew dilê ketî xakê girt û xwar! Şêr li dil geriya lê nedît.

Rûvî got:

-Ma dilê tebayên bi vî awayî hene?

## Wateyên Peyvan

**Ciniqîn**: Hilbeyîn, tirsadina ji tiştekî.

**Dost:** Heval, kesê mirov bikare razên xwe jê re bêje.

Ew peyv û gotinên din yên hûn nizanin ji ferhengê sûd bigirin û wateya wan, li lênûsa xwe binivîsin.

## Destûrên Ziman

1- Şêrê nexweş ji rûvî çi xwest?
2- Rûvî, xezal bi kîjan peyvan xapand û çi hat serê xezalê?
3- Di nava civakê de mirovên xwediyên van taybetmendiyan hene yan ne?

## Destûrên Ziman

Di hevoka "Di cih de xwe avêt li ser pişta xezalê." de kîjan daçek peyda dibin?

**1-** Di hevoka "Rêyekê bibîne wê xezalê ji min re bîne." de çend tîp hene?

**2-** Di hevokên jêr de alava gihanek "û" bi serê xwe ji peyvan cuda hatiye nivîsandin.

Ket pey rûvî **û** berê xwe da şkeftê.

Dîsan **jî** xezal xapand.

***Gihanek***, *Dû peyvan yan jî dû hevokan bi hev ve dide girêdan.*

## HÎNDARÎ

**1**- Bûyerên di mijarê de derbas dibin, bi rêzê ve bibêjin. Sojeya wê ji parçeyê derxin û li lênûsa xwe binivîsin.

**2**- Pirtûkeke we xwendî, bi hevalê xwe bide nasandin. Dema hûn danasînê dikin, li ser van xalên jêrîn rawestin:

**a**- Navê nivîskarê pirtûkê bibêjin.

**b**- Bûyerên di pirtûkê de derbas dibin, bi rêzê ve bêjin.

**c-** Aliyê pirtûkê yê herî we jê hezkirî bêjin.

**3**- Di refê de bûyerek hevalê we tîne ziman binivîsin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Dema hûn xebatên nivîsîna binîgar bikin, destpêkê nivîsandina li jêr, li lênûsa xwe binivîsin:

***"Min jî li ser vê rêya dijwar gelek kiriye qîr û hewar da ji bo we dinya bibe rojeke gulbihar."***

***Dr.Mihemed Nûrî DÊRSIMÎ***





**M. Nûrî Dêrsimî**
**1893 - 1973**

## MIJARA SERBEST

### MAMOSTEYÊ LEHENG



Çelengeke zana û şêr,
Li gel pênûsê heye kêr.
Hem natirse gelek camêr,
Jibo gelan hat ji bajêr.

Şoreşgere ji Çewlikê,
Tişta dibê, kare bikê.
Narazê li ber tifikê,
Gel çi dixwaze ew dikê.

Mamostaye hem rêbere,
Ne ji rêzê şoreşgere.
Bivê dozê tam bawere,
Hem pêşenge, hem serwere.

Dema hate dûwê Gulan,
Hişîn dibûn gul û şîlan.
Heştê û sêyan bû cangorî,
Ji nû bû mêvanê Yezdan.

# BÊKÊRIYÊN DARDAROK

Dardarokekî weke mirovan ji aliyê hostayekî xerat ve hatiye çêkirin. Zarokatiya vî dardarokî bi bêkêriyan derbas bûye. Yên li jêr hinek ji bêkêryên wî yên destpêkê ne.

Xerat li kolanekê di odeyek biçûk de rûdinişt. Dema xerat hat odeya xwe, di cih de amûrên xwe derxist û ji bo çêkirina dardarokî dest bi kolana dar kir.


Xerat ji xwe re digot; ez ê navê wî bikim rindo û dest pê kir. Dema ku dor hatibû çêkirina dev, berî ku temam bibe wî dest bi ken û helbestgotinê kir.

Dema ku xerat dev temam kir û piştre erzing, mil, sîng, dest û çengên wî jî temam kirin. Dema ku xerat destên rindo temamkirin, pêhay bû ku şaşika wî ya zer ji ser serê wî hat rakirin. Dema ku li şûn xwe zivirî dît ku şaşika wî di destê rindo de ye. Gotê:

-Rindo! Bi lez şaşika min bide min lê şûna rindo şaşikê bide xerat, danî ser serê xwe.

Xerat destê Rindo girt, danî ber xwe û ew fêrî rêveçûnê kir. Dema ku Rindo fêrî rêveçûnê bû, derket kolanê û revî. Xerat li pey wî baz da lê negirt. Piştî demekê ew bi xwe vegeriya malê. Dema vegeriya malê ji xwe re wiha got:

- Mala pîrê xweşti re ji mala mîrê.



## Wateyên Peyvan

**Şaşik**: Kefiya bi rêkûpêk li dora serî tê pêçan.
**Xerat**: Kesê ku huneriya daran dike (necar).
**Dardarok:** Heyîna di rengê mirovan de ji daran tê çêkirin.

## Em Têbigihin

1- Xerat çi nav li dardarok kir?
2- Xerat bi rêzê ve kîjan lebetên dardarok çêkirin?
3- Piştî ku Rindo vegeriya çi ji xwe re got?

## Destûrên Ziman

1- Di hevokên jêr de hindek peyv bi tîpên **"ç, k, p, r, t"**yê hatine destpêkirin weke:

**Ker** **ker**
**Ta** **ta**
**Pir** **pir**
**Çal** **çal**
**Par** **Par**

*Ji tîpên "**ç, k, p, r, t**"ê re **tîpêncêwî** tên gotin.* Ji ber ku dû dengan (hişk û nerm) derdixin.

2- Cudahiya van peyvan di wateya hevokê û kişandina peyvan de diyar dibe.

**Mînak:**

**Ker**ê me boz e.
Ew **ker** bûye.
**Pir**a Malabadê dîrokî ye.
Li welatê me çiya **pir** in.
Derê mala me **çal** e.
Bizina me **çal** e.
Derya bi **tor**a xwe masî girt.
Egîd ji herêma **tor**ê ye.

## HÎNDARÎ

1- Filmekî we di televizyonê de temaşe kirî, mijara wê çi bû? Ramana bingehîn, li lênûsa xwe binivîsin.

2- Yên ku bi karên wekî xerat, berber, koşkar û hêsinkariyê ve mijûl dibin, bidin nasîn.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Peyvên li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin. Karê nivîsînê heta hûn rast dinivîsîn, berdewam bikin.

**Bawer- xezal- bihar- mizgîn- kevok- hesp**
**Hêvîdar- gulan- bahoz- serbaz**



# LI SER WERÎS ARD HATIYE RAXISTIN

Rojek ji rojan, cîranekî Melayê Navdar tê mala wî û werîs jê dixwaze. Cîran dest bi hêvî û tikayan dike:

- Dema karê min bi dawî bibe, ez ê bînim. Lê Mela nedixwest bide. Hezar û yek astengî ji cîranê xwe re derdixist.

Gelek sedemên nebûyî afirandin.

Mînak:

- Me li ser werîs ard raxistiye.

Cîran got:

- Mela, ezbenî! Ma ard li ser werîs tê raxistin? Ev çi kar e?

Mele bêzar bû:

- Ger min niyaza dayînê nebe, ard jî li ser tê raxistin û genim jî tê raxistin.



## Wateyên Peyvan

**Hezar û yek asteng**: hecet- bihane
**Niyaz**: Niyet

## Em Têbigihin

1- Cîran çi ji Mela dixwaze?
2- Mela çawa bersiv da cîranê xwe?
3- Gotina "Ard li ser werîs raxistiye." tê çi wateyê?

## Destûrên Ziman

1- Di mijarê de peyva “raxistin" derbas dibe, li ser peyva “**xistin”** pêşgira **"ra"** hatiye zêdekirin, em ji van pêşgiran re dibêjin, ***pêvekên sazker***.

***Mînak:***

Kirin – **ra**kirin Xistin - **ra**xistin

Di zimanê Kurdî de, bi van pêşgiran peyvên nû tên sazkirin.

2- Di mijarê de hevokên axaftinê bi çi awayî hatine diyarkirin?

## HÎNDARÎ

1- Nivîsên di derbarê Mela de hene peyda bikin û bixwînin.

2- Pêkenokeke xweş, li lênûsa xwe binivîsin. Axaftinên di pêkenokê de derbas dibin bi awayê bend û xêzika axaftinê bikar bînin. Hêmayên din jî di cihê wan de bikar bînin. Dema hûn dinivîsin, li gor destûrên nivîsandinê tev bigerin. Pêkenoka we nivîsî, ji hevalên xwe re bixwînin.

# MIJARA SERBEST

## WERZÎŞ



Werzîş karek gelek xweşe,
Şeng û ciwaniya leşe.
Nexweşî li cem wê nîne,
Sistî li rex wê na meşe.

Gelî xwendekar tev bizan,
Werzîş waneyek pir ciwan.
Tevde bankin xort û keçan,
Werzîş bikin heya hetan.

Her êvar li hev bi civin,
Biyariyan em bilivin.
Heskiriyan em bibînin,
Hinek ji wan wek hingivin.



## Wateyên Peyvan

**Şeng:** Şox, delal
**Sistî**: xavî
**Heya-Hetan**: heya dawî
**Yariyan**: Laqirdî- henek
**Hingiv**: Hingivîn

# ROJNAMEFIROŞ




Ez rojnamefiroş im. Dû sal in vî karî dikim. Hem kar dikim hem dixwînim. Dibistana min danê spêdê ye. Piştî nîvro heta demjimêr pêncan li waneyên xwe dixebitim. Paşê pirtûkan kom dikim û dibezim; xwe berdidim şeqamên Amedê. Dereng mayîn nabe. Yê ku dereng bimîne, bê kar dimîne. Çapa îro derketiye. Ez desteyek mezin dikim bin çengê xwe, dibezim û diçim cihê xwe.

Gelek zarokên weke min rojnameyan difiroşin. Cihê me hemûyan diyar e. Dema ez digihim cihê xwe, bang dikim. Bûyera herî girîng a rojê çi ye, bi dengekî bilind tînim ziman. Qîrîn gelek baş e. Mirovên diçin û tên meraq dikin û rojnameyê dikirin. Ji bo bikirin her dem pêwîstî bi bangkirinê nîn e. Çawa bibe jî ew ê bikirin. Bi şev demjimêr08:00'ê vedigerim malê.
Rojname diraveke wisa zêde nade. Tenê mezaxa pênûs û pirtûkan derdikevin. Em pênc bira ne. Bavê me karker e, ji bo aboriya malê, em tev kar dikin.

Bavê min dibêje: "**Heta dest reş nebin, tama dev xweş nabe**."
Di dibistanê de hevalên min û mamosteyên min hemû dizanin, ez rojnameyan difiroşim. Dema çend kesan nû pê zanîn tinazên xwe bi min kirin. Ez bi vê rewşê gelekî dilteng bûm. Hinek mamosteyên min jî wêrekî dan min. Digotin: "Xebat û ked tiştekî herî baş e." Ez dixwazim xwendina xwe berdewam bikim. Ji niha û pê ve jî ez ê hem kar bikim hem bixwînim.

Ez ê bixwînim û bibim rojnamegerekî serkeftî. Wê demê ez rojnameyan nafiroşim, ez ê di rojnameyan de binivîsim.

## Wateyên Peyvan

**Çap:** Pergala zêdekirina pirtûk, kovar, rojname û hwd.
**Dirav:** Pere
**Tinaz:** Tirane û henek
**Mezaxtin:** Xerckirin

## Em Têbigihin

1- Zarok rojnameyan çawa difiroşe?
2- Heval,mamoste û zarok dema zanîn ku rojnameyan difiroşe, çawa nêzîkî wî bûn?
3- Di nivîsê de taybetiyên zarok û malbata wî çawa tê ziman?

## Destûrên Ziman

1- Li ser peyva "**rojname**" pêveka paşgir (van) hatiye zêdekirin, ji van her duyan peyvek nû hatiye sazkirin. Wateya rojname û rojnamevan bizanin û her yekê di hevokekê de bikar bînin.
2- Di hevoka "Yê dereng bimîne, bêkar dimîne." de, li ser peyva kar pêşgira "**bê**" hatiye zêdekirin. Bi awayê navekî nû hatiye diyarkirin. Hûn jî peyvên "**bi kar, bê kar**" di nav hevokên cuda de bikar bînin.

## HÎNDARÎ

1- Ji mijara we xwendî, sûd bigirin, zarokên rojnamefiroş û herêmên rojname tê firotin, zîndî bikin.
2- Rojnameyekî bînin refa xwe. Di vê rojnameyê de bûyerekî girîng hilbijêrin û ji hevalên xwe re bixwînin.
3- Bûyerên hevalên we dixwînin, bi balkêşî guhdar bikin.

## TESTII.

***DESKEFTIYÊN HERÎ GIRÎNG***

***Eger ev nivîskar nebûna, gelo me karibû cîhana xwe nas bikira? Ma em ji vê jiyana zor hes bikin? Em dikarin xweşiyekê bibînin? Tiştên ji aliyê mirovan ve hatine afirandin çi ne? Zêde nehizirin bêguman pirtûk in; pêşketina mirovahiyê bi pirtûkan dest pê dike lê tenê bi pirtûkan dawî nabe. Divê her pirtûka ku nû tê nivîsîn, weke kelpîçê avahiyekê yek yê din bilind bike. Li gor min:" Dema pirtûk nemînin, pêşketina mirovahiyê kêm dibe."***

***Her du pirsên jêr ên destpêkê li gor mijara jor bersiv bidin.***

**1- Li gor nivîskar tişta herî girîng ji aliyê mirovan ve hatiye afirandin çi ye?**

**a**) Pêşketin

**b**) Evîndarî

**c)** Pirtûk

**d)** Xweşikbûn

**2- Li gorî nivîskar dema pirtûk nemînin wê çi bibe?**
**a)** Mirov nikarin bihizirin.
**b)** Pêşketina mirovahiyê kêm dibe.
**c)** Şaristaniyeke nû dest pê dike.
**d**) Kêfxweşî dibe.
**3- Ji bo em fêrî wateya peyvan bibin, em li çi dinêrin?**
**a**) Pirtûka waneyê
**b**) Ferheng
**c**) Pirtûka dîrokê
**d)** Pirtûka erdnîgarî
**4- Ji vebijêrkên jêrin kîjan navê giştî ye?**
**a)** Radyo
**b)** Dersîm
**c)** Amed
**d)** Laleş
**5- Ji tîpên jêr kîjan tîpên cêwî ne?**
**a)** A-R-Ç-Z-W
**b)** P-F-K-R-Z
**c)** Ç-K-P-R-T
**d**) E-K-V-P-Ç
**6- Ji van peyvên jêrîn, kîjan di ferhengê de, di rêza duyem de cih digire?**
**a**) Bihar
**b**) Bênder
**c**) Ber
**d**) Bacan

**7- Kîjan ji hevokên jêrîn hevoka pirsyarî ye?**
**a**) Mala me li serê kolanê ye
**b**) Roja şemiyê ez ê biçim rezan
**c)** Temenê te çend salan ji yê bavê te kêmtir e
**d)** Li çiyan di cih de hewa sar bû
**8- Ji peyvên li jêr kîjan bi pêşgirekê hatiye sazkirin?**
**a**) Gavan
**b)** Veger
**c)** Hunermend
**d)** Dengdar
**9- Di hevoka "Îro Newrozê name nivîsî." de kîjan peyv kar e?**
**a**) Îro
**b**) Newrozê
**c)** Name
**d**) Nivîsî
**10- "Gula sor û Binevşa bilind diçin dibistanê."**
**Di hevoka jor de çend hevalnav hatine bikaranîn?**
**a**) 1
**b**) 2
**c**) 3
**d**) 4

# BEŞA 3

## XEBATA ÇÊKIRINA KELEKÊ

Rojekê, malbetek ji bo ger û geştê biryara, gera li ser deryayê dide û gera xwe pêk tîne. Di pêvajoya ger û geşta wan de, keştiya wan li nêzîkî peravên giravêkê xiradibe û biryara çêkirina kelekekê ji bo xwe didin. Bav dibêje: “a niha di dilê min de daxwazek mezin çêbûye. Ji bo anîna parçeyên keleka rizgarker, ezê biçûma gel keştiya xirabûyî. Ji ber ku baweriya malbata min bi deryayê nebû. Nedixwest ti zarokan bide gel min û nedixwest ez jî biçim. Dema peymana misogerkirina zivirîna êvarê min da, min karibû malbata xwe razî bikim.



Dema gihîştina keştiyê, ji bo ez bikarim hêsan bihizirim, li cihekî rûniştim, ka ez ê çi ji keştiyê bikim. Zarok jî bi serê xwe çûn keştiya xirabûyî, çi tiştên tê de hebûn kişandin. Piştre ez jî rabûm û min dest bi kar kir. Cihên keştiyê yên saxlem min jê vedikir û ji bo çêkirina kelekeke nû xebat dikir. Piştre zarok jî hatin alîkarî dan min.

Dema tarî ket erdê, tu pêşketin di karê me de çênebûbû. Belê pêwîst bû em bizivirin li gel malbatê jî. Roja din dîsa em li ser heman xebatê bûn. Em wiha tam heftiyekê xebitîn.

Di encam de tiştek çêbibû. Keleka ku çêbûyî pir xweşik xuya dikir. Pir sivik bû, wekî keştiya bi yek bawankê bi kar bê.

Vê kelekê, pir xweşik daxwaza melevaniya li ser avê dikir. Bê hedar li benda girêdana stûnan û bawanka xwe dima. Ji bo rêketinê amade bû. Lê belê me karibû bi hêsanî wê bibin deynin nava deryayê, lê berî danîna nava avê min werîs bi kelekê ve girêda.

Ez zêde ji ketina wê ya nav avê ditirsiyam. Piştî danîna nav avê, me xwe avêt tê de, stûn û bawankê wê bi cih kirin. Em keleka xwe siwar bûn û rizgar bûn.”

## Wateyên Peyvan

**Keştî:** Gemî
**Girav:** Bejahiya di nav avê de
**Bizav:** Liv, tevger
**Bawank:** Babirk, bawan
**Kelek:** Amûra herî destpêkê ya çûyîna li ser avê.

## Em Têbigihin

1-Amûrên ku malbatê keleka xwe pê çêkirin ji ku derê peyda kirin?
2-Malbatê çima nedixwest zarok li gel bavê xwe biçin?
3-Bav û zarokên xwe dikeştiya xirabûyî de xebatên çawa kirin?
4-Keştî çawa danîn nav deryayê?

## Destûrên Ziman

Di hevokên jêr de daçekên bi paşdaçekan hatine diyarkirin. Hûn jî bi her daçekeke bi paşdaçek dû hevokan saz bikin.

**Di** wê girava bê mirov **de**, malbat ma.

**Ji** aliyê bavê wan **ve** hatiye ziman.

Daçek jî peyvên axaftinê ne lê ew bi serê xwe nabin endamê hevokê. Daçek berî nav û cînavan tên.

## HÎNDARÎ


"Pêdivî dayîka afirandinê ye." Li ser vê gotinê tiştekî we ji neçarî afirandiye bi hevalên xwe re parve bikin.

# ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ

Rêzan ji birîndariya xwe bê hiş ketibû. Şervaneke azadiyê ew girt bir nexweşxanê. Agahî dan dê û bavê wî. Dê û bavê wî bi lezgînî hatin. Piştî nêrîna bijîşk hate zanîn ku kûçikê ku bi Rêzan girtibû har bû. Bijîşk gelek xemgîn bû. Lewra Rêzan bi tirsek mezin re rû bi rû mabû. Tirsnaka mirinê! Di derbarê vê nexweşiyê de, bi navê Ecîb bijîşkekî pispor li bajarê Hewlêrê hebû. Bi lezgînî Rêzanê biçûk şandin Hewlêrê. Salnameyê 6'ê Tîrmeha 1999'an nîşan dida. Bijîşk Ecîb, di vê nexweşiyê de gelek serkeftî bû.

Dijmîkroba nexweşiya hariyê pisporek bi navê Pastor dîtibû. Bijîşk Ecîb ev dijmîkrob li ser Rêzanê biçûk bi kar anî.

Bijîşk Ecîb, roj bi roj Rêzanê biçûk dişopîne, dibîne ku ew ber bi başiyê ve diçe.  Bijîşk Ecîb, berbanga sibeheke westiyayî û li ber pacê xewmaş bû, dema ku çavên xwe vedike, dibîne ku Rêzanê biçûk baş bûye.



## Wateyên Peyvan

**Har:** Nexweşiyeke ku ji gezdana lawirên wek kuçik, rovî, gur û hwd çêdibe.
**Salname:** Teqwîm
**Dijmîkrop:** Antîmîkrop
**Bijîşk:** Dixtor, hekîm
**Pispor:** Kesên di her pîşeyekê de kûr bûyî.

## Em Têbigihin

1- Ji bo çi Rêzan rakirin nexweşxana Hewlêrê?
2- Bijîşk Ecîb çawa Rêzanê biçûk derman kir?

## Destûrên Ziman

**1-** Peyva "**doxtor** " bi kurtî çawa tê nivîsîn?
**2-** Daçekên di nava mijarê de nîşan bidin û mînakan jê bidin.
**3-** Daçekên li jêr hatine nivîsîn di hevokên jêr de binivîsin.

**“di-de, ji-ve, bi-re”**
Azad … duh … nehatiye malê.
Sosin … refê … ma.
Şîlan … mamoste … çû.

**4-** Dijwateyên peyvên li jêr bibînin û ji bo her yekê hevokekê saz bikin.

**“zêde, mezin, dawî”**

**5-**Hevokên li jêr hatîn nivîsîn bi van peyvan temam bikin.

**“şandin, hatin, birin”**
Dayik û bavê wî ………
Şervaneke azadiyê ……….. cem bijîşk.
Bilezgînî Rêzanê biçûk ………… Hewlêrê.

Hevokên we temam kirin, kîjan peyv kirin û bizavê dide diyarkirin? Hûn dizanin:
*Ji peyvên di nav hevokê de kirin û bizavê didin diyarkirin re dibêjin* ***kar***.

## HÎNDARÎ

1- Kurtenivîsa we xwendî li lênûsa xwe binivîsin.
2- Serdana nexweşan karekî baş e.
3-Dijmîkrob çi ye? Bikaranîna dijmîkrobê sûdeke çawa dide mirovan?

# NAMEYA JI BO HÊVIYÊ

Hevala Hêvî!

Ev bûn pazdeh roj, ez ji we veqetiyame. Lê min ew qas bêriya we kiriye ku!…

Ez hêdî hêdî fêrî refa xwe dibim. Di refa me de hevalên gelek baş hene. Ha yek heye bi navê Evîn; Bi hinek taybetmendiyên xwe ve wekî te ye. Ji ber vê em zû li hev bisteh bûn.

Mamosteya min jî, pir baş e. Miroveke rûbiken e. Pir germ nêzîkî min bû. Navê min ji ber kiriye. Di waneya destpêkê de bi navê min gazî min kir. Got:"Tu çawa yî Negrî?" di derbarê dê û bavê min de gelek pirs ji min kirin. Di derbarê dibistan û cihê ku ez jê hatime de agahî ji min xwestin. Min jê re got. Bi vî rengî ye. Hevalên di refê de jî ez nas kirim. Me ji bajarê Wanê pir hes kir. Wan; bajarekî gelek girîng e, her aliyê wê şîn e û gelek cihên geştê lê hene. Jixwe Gola Wanê ciwaniyeke cuda dide bajêr. Pisîka Wanê jî tê zanîn, di Cîhanê de navdar e. Bermahiyên dîrokî û muzexane lê pir in. Lê hêj em li tevan negeriyane.

Di bêhndana pêşiya me de, ez li Wanê li benda te me. Em ê bi hev re bigerin, bilîzîn û bêhna xwe vekin. Ez li hêviya nameya te me.

Ez ji te û tevahî hevalan re silav û hezkirinên xwe rê dikim.
Serkeftinê dixwazim…

***Navnîşan***
***Taxa Şîn***
***Kolana 176***
***Jimar11/5***
***Wan***

***Wajo***
***Negrî Sîpan***
***19.05.2013***



## Wateyên Peyvan

**Bêrîkirin:** Hestên daxwaza dîtinê.
**Rûbiken:** Kêfxweş, rûgeş
**Geşt:** Ger û seyran
**Bermahiyên dîrokî**: Tiştên ku kevin hatine çêkirin û bala mirovan dikişînin.
**Muzexane:** Cihên tiştên kevnare û zanîstî tê de tên parastin, ji bo dîtina gel tên pêşkêşkirin.

## Em Têbigihin

1- Namenivîs kî ye?
2- Name ji bo kê hatiye nivîsin?
3- Di nameya xwe de, di derbarê dibistana xwe ya nû de çi gotiye?
4- Dabaşa kîjan taybetmendiyên bajarê Wanê hatiye kirin?
5- Di her dû bendên dawî de dabaşa çi dike?
6- Dîrok, wajo û navnîşan li ku derê tê nivîsîn?

## Destûrên Ziman

1- Di nameyê de li dawiya peyva bangî çi nîşan hatiye danîn?
2- Di nameyê de navê bajêr çawa hatiye nivîsîn?
3- Di navbera jimarên roj, meh û dîroka salê de çi nîşan hatiye danîn?
4- Navên cih û kesên di nivîsê de, li lênûsa xwe binivîsin.
5- Navên taybet çi ne?
6- Di nameyê de navê giştî kîjan in, li lênûsa xwe binivîsin.

## HÎNDARÎ

1- Nameyekî ji bo kesekî hûn dinasin binivîsin.

Nameya we nivîsî li gor pirsên hatine kirin sererast bikin.

- ✓ Tişta min dixwest jê re bibêjim, min bê kêmasî nivîsiye?
- ✓ Min peyv û hevok rast nivîsîne?
- ✓ Min tîpên gir û hêmaya xal li cihê wan danîne?
- ✓ Min li jor milê rastê dîrok, li jêr milê çepê navnîşan daniye?
- ✓ Min li jêr milê yê rastê, nav û wajoya xwe daniye?

2- Piştî we sererastkirinên di nameya xwe de pêk anîn, nameya xwe bi pênûsekê hibir, li kaxezeke bêxêzik binivîsin.


3- Nameya we nivîsî bixin têgirekê, li ser têgirê mînaka li jêr binivîsin. Nameya xwe bibin postexanê û rêkin.

# Mînaka Têgirê

***Hinêr: Negrî Sîpan***
***Taxa Şîn***
***Kolana 176***
***Jm: 11/5***
***Wan***

PUL

***Birêz: Hêvî Çiya***
***Taxa Cudî***
***Kolana Çiya***
***Jm:24/6***
***Cizîr/Şirnex***



# HINDO Û RINDO




**Hindo**: Êvarbaş Rindoyê min.
**Rindo**: Bi xêr hatî.
**Hindo**: Way gewrem, min kefiyek ji bo serê xwe kirîbû. Dema ez hatim ji bo bêhndanê min xwest serekî li Rindo bidim.
**Rindo**: Te kefî ji xwe re kiriye, ji min re çi?
**Hindo**: Ma wisa tê gotin?
**Rindo**: Lê çi tê gotin?
**Hindo**: Ma gotina "pîroz be, nexşe li sedên din be" nîne?
**Rindo**: Pîroz be, nexşe li sedên din be.
**Hindo**: Bijî, ha! Wisa tê gotin. Gewrem dar jî di mal de qediyane. Hinek daran bikire. Ez çûm min 15 kêş dar kirîn.
**Rindo**: Pîroz be nexşe li sedên din be.
**Hindo**: Wisa nabêjin.
**Rindo**: Ez çi dizanim? Te we got.

**Rindo**: Ew ji bo kefiyê bû.
**Rindo**: Êêê! Ez çi bibêjim?
**Hindo**: "*Bi xweşî bişewitîne, rûne li xweliya wê bimeyzîne*." nayê gotin?
**Rindo:** Bi xweşî bişewitîne, rûne li xweliya wê bimeyzîne.
**Hindo**: Gewrem; ji ber ku ban qelişîbû, barana wê rojê barî hemû hat hundir. Min banî karkerekî kir, cihê qelişî hemû dagirtin.
**Rindo**: Bixweşî bişewitîne, rûne li xweliya wê bimeyzîne.
**Hindo**: Looo! Wisa nayê gotin.
**Rindo**: Ma çi tê gotin?
**Hindo**: Ma nayê xwestin mirov bibêje: "Eh eh maşalah, bi xweşî tê de rûne?”
**Rindo**: Eh eh maşalah, bi xweşî tê de rûne.
**Hindo**: Ez xweş berx bûm, gewrem, xweşberx.
**Rindo**: Ez jî xweş text bûm, gewrem xweşberx.
**Hindo**: Wateya wê çi ye?
**Rindo**: Wateya "*şabûnê"* ye.
**Hindo**: Dê wisa bibêje ha! Tû her bijî: "Ez bûm xweş text û xweş berx".

## Wateyên Peyvan

**Gewrem:** Mezinê min,.
**Nexşe li sedên din be:** Tu gelek din jî wekî vê kevin bikî.
**Qediyan:** Bi dawî hatin.
**Bimeyzîne:** Binêre, temaşe bike.
**Maşalah:** Bereket, nezer lê nebe.
**Xweşbext:** Bextewar.

## Em Têbigihin

1- Hindo û Rindo li ser çi mijaran goftûgo dikin?
2- Rindo bersivên çawa dide pirsên Hindo?
3- Di nivîsê de kîjan peyvê hûn kenandin?

## Destûrên Ziman

1- Di nivîsê de, hevokên axaftinê bi çi hatine nîşankirin?
2- Di hevokên jêr de cihên bêhnok lê nehatine danîn temam bikin û li lênûsa xwe binivîsin.
-Bixweşî bişewitîne rûne li xweliya wê bimeyzîne.
-Ban qelişîbû baran tev hatibû hundir.
-Ez bûm xweştext ez bûm xweşberx.
3- Di hevokên jêr de peyvên li cihê nav hatine nivîsîn li lênûsa xwe binivîsin.
**Te** çi got?
**Ez** bûm xweşberx, gewrem, xweşberx.
**Wî** kefî kirîbû.

## HÎNDARÎ

1- Hûn di derbarê Hindo û Rindo de çi dizanin? Bi çend hevokan binivîsin.

2- We temaşeyî kîjan lîstokên zarokan kirine? Yekî ji wan ji hevalên xwe re bêjin.

3- Li bazarê tiştekî bikirin goftûgoyên di navbera we û firoşkar de pêş ketine bi awayê goftûgo zindî bikin.

4- Lîstokên wiha em dikarin di sînema û şanogehan de bi gelek mirovan re temaşe bikin? Di holan de gelek axaftin û pîrozbahî tên kirin. Di cihên wiha de, xalên li ber çav bên girtin li jêr hatine rêzkirin.

- Di ketin û derketina derên wiha de, keseke bêzar nekin.
- Divê hûn bêdeng, di cihê xwe de rûnin, bi awayekî balkêş temaşe û guhdarî bikin.
- Di demên pêwîst de, ji bo bêjer û hunermendan çepikan lê bidin.

# MIJARA SERBEST

## DESTANA KAWA




Bi navê Dehaq, qralek hebû û wî bi salan gelek zilm û zordarî li gelên herêmê dikir. Nexweşiyeke giran Dehaq digire. Bijîşkên wî dibêjin dermanê vê nexweşiyê mêjiyê mirovan e. Divê her roj Dehaq mejiyê dû ciwanan li birînên xwe bide da ku ji jana wê nexweşiyê rizgar bibe. Dehaq, ferman da ku her roj dû mêjiyên ciwanan bînin qesra wî.



Bi vî awayî Dehaq bi salan ciwan kuştin û zilm û zora xwe li ser gelê Kurdistanê domand. Kurdistaniyan êdî nedixwestin ku zarokên wan bên kuştin. Wan ciwan şandin çiyayan, ew parastin û veşartin. Roj bi roj hejmara ciwanan li çiyayan pirtir dibû, ji ber ku ji bo jiyaneke azad çiya ji hemû cihan bi ewletir bûn. Nêzîkî qesra Dehaq li gundekî, mirovekî bi navê **Kawayê Hesinkar** hebû. Wî ji bo leşkerê qral çek çêdikirin. Dû zarokên Kawayê Hesinkar jî hatibûn gorî kirin. Dema ku dor tê kurê wî yê biçûk, vê carê, xwest ku ji vê rewşê re çareseriyekî bibîne. Ew hemû çekên kowara xwe dide gundiyan û li ciwanên li serê çiyê belav dike.

Kawayê Hesinkar serhildaneke mezin dide destpêkirin. Di bin pêşengiya wî de gundî û ciwanên serê çiyê êrîşê dibin ser Qesra Dehaqê zalim. Dehaq û leşkerên wî dikujin û qesra wî dişewitînin.

Gundî û şervanên azadiyê heta destê sibê li ber ronahiya agirê azadiyê govendê digirin. Azadî û serxwebûna xwe pîroz dikin. Ji wê rojê heta niha 21'ê Adarê ji aliyê Kurdan û gelên herêmê ve wekî roja rizgarî û serfiraziyê tê pejirandin û pîrozkirin.



## Wateyên Peyvan

**Zilm:** Zext û zordarî
**Kewar:** Ambar, karik
**Gorîkirin:** Qurbankirin
**Serhildan:** Li hember zor û bêmafiyê serî rakirin
**Serfirazî:** Serbilindî
**Jan:** Êş
**Rizgar:** Xilas

## Em Têbigihin

1- Çima Dehaq ciwanên Kurd dikuştin?
2- Ciwan li kûderê dihatin parastin?
3- Kawayê Hesinkar çawa serhildan da dest pê kirin?
4- Çima 21'ê Adarê ji aliyê Kurdan û gelên herêmê ve tê pîrozkirin?

## Destûrên Ziman

1- Di mijarê de peyva "**serfirazî**" derbas dibe, hevwateya wê bibînin û di hevokekê de bi kar bînin.
2- Navên yekjimar ên di hevoka jêr de li lênûsa xwe binivîsin.
" Kawayê Hesinkar serhildaneke mezindide destpêkirin."

## HÎNDARÎ

**1**-Tiştên ku hûn di derbarê destana Kawayê Hesinkar de dizanin bibêjin.
**2**-Navê çar destanên Kurdan binivîsin.

# MAF

Dilê min, dilê şîp û şêr
Pozê çiya datînim jêr
Şer dikim îro ne wek pêr
Mafê xwe nadim bi zîv, zêr

Hey Kurdên otonomîxwaz
Hûn in kole û bê miraz
Ji dijmin tim bi hêvî, gaz
Ser te de hatim wekî baz

Demarê eniya Egîd im
Tîrêjên çavên Cimşîd im
Ji bo mafê xwe şehîd im
Her heme, ez qet namirim

Dimirînim, qet namirim
Agir im, pêt im, bager im
Ji doza xwe venagerim
Ez li mafê xwe digerim

***Ş. Ferhad Masîro***



## Wateyên Peyvan

**Doz:** Tişta ku mirov ji xwe re dike armanc.
**Şîp:** Şepal, çêlikên şêran.
**Otonomî:** Rêveberiya herêmî (hukmê zatî).
**Miraz:** Hêvî, daxwaz.

## Em Têbigihin

1- Maf çi ye, çima helbestvan dibêje "Ez li mafê xwe digerim"?
2- Wateya "Dimirînim qet namirim"çi ye?
3- Helbestvan di malika duyem de xwe dişibîne çi?

## Destûrên Ziman

1- Sererêzikên helbestê bi tîpên çawa hatine nivîsîn?
2 -Hevoka li jêr, li lênûsa xwe binivîsin, bêhnokên wan bi cih bikin.

"**Hesp kulîlk çiya daristan û ciwan ji dûr ve xuya dikin.**"

## HÎNDARÎ

1- Helbestê bi balkêşî bêdeng bixwînin.
2- Li ser helbest xwendina mamosteyê xwe baldar bin, ka çawa dixwîne? Li kûderê kêm, li kûderê zêde radiweste?
3- Helbestê bi dengê bilind bixwîne, hevalê we yê ku helbestan herî baş dixwîne hilbijêrin.
5- Doza we çi ye? Hûn çiqas li pey doza xwe digerin?
6- Ji bo ku mirov mafê xwe biparêze, pêwîst e, mirov çawa nêzîkî mafên kesên din bibe?

# GIMGIMOKA BIÇÛK

Hebû nebû, di demên kevin de gimgimokeke biçûk hebû. Rojekê gimgimok li daristanê digeriya. Cama ku li erdê diteyîsî dît. Lê dinêre ku ew neynikek e.

Gimgimok demekî dûr û dirêj di neynikê de li xwe dinêre. Rûyê wê yê bitirs, serê wê yê mezin, diranên wê yên tûj û dûvê wê yê dirêj pir li xweşa wî hatibû.

Carekê çi bibîne! Li beramberî wê tîmsahek dihat! Tîmsah dimîne wê, lê tîmsah ji gimgimokê pir meztir bû. Gimgimok dihizire; "Belkî ez jî têjika tîmsahê bim. Dema ez mezin bibim ez jî dê bibim tîmsaheke wiha."

Gimgimoka biçûk êdî pesnê hevalên xwe nedida û xwe ji hevalên xwe mezintir didît. Her kesî jê re digot: "Dema tû mezin bibî, dîsa tû yê her wekî gimgimok bimînî û neyê guhertin." Lê gimgimokê digot: "Na! Ez tîmsahek im."

.



Êdî tim li gel tîmsahan digeriya, tiştên wan dikir, wê jî hewl dida ku heman tiştan dubare bike. Rojekê dibîne ku tîmsah xwe li avê didin. Gimgimok jî xwe li avê dide, dixwaze melevaniyê bike. Dema ku tîmsahan xweşik, xweşik melevanî dikirin, gimgimok jî bin av dibû. Li milê din jî diqêriya: "Hawar! hawar! Min rizgar bikin, ez ê bixeniqim." Masiyê ku di wir re derbas dibû, bang li gimgimokê kir: "Ma tû jî ne tîmsah î? Tû jî melevaniyê bike!" “Na! Na! Ez gimgimoka biçûk im, melevaniyê nizanim û min rizgar bike." Wê demê tîmsahekê dûvê xwe yê mezin dirêj kir, gimgimokê xwe pê ve kir û derbasî rexa avê bû. Tîmsahê got: Careke din ji rastiya xwe dûr nekeve.

Gimgimok gelek şermîn bûbû. Ji wê rojê û pê ve her dem xwest bibe gimgimokek baş

## Wateyên Peyvan

**Gimgimok:** Lawirek xişandeke, xwînsar, li ser kevir û tehtan dijî, kanegor, kingirat

**Tîmsah:** Tebayekî xişinde ye ku di av û bejahiyê de dijî.

**Dûv:** Kurî, boçik, terî

**Teyîs:** Çiris, biriqî

## Em Têbigihin

1- Gimgimokê çima xwe weke tîmsah didît?
2- Di beşa vekirina nivîsê de çi tê, têgihandin?
3- Timsaha ku bi dûvê xwe gimgimok rizgarkirî, waneyeke çawa dide wê?

## Destûrên Ziman

**1-** Hevoka li jêr li lênûsa xwe binivîsin; kirek, kar û pêkirê wê diyar bikin. **Tîmsahan melevanî dikir**. Bersiva pirsa "kê dikir?" dibe "**kirek.**"

*Ev peyvên di hevokê de kar, bûyer û rewşekê yan bizavekê didin diyarkirin jê re dibêjin "**kar.**"*

*Peyvên dibin bersiva pirsên "çi dikirin" jê re dibêjin "**pêkir.**"*

## HÎNDARÎ

Nivîsekê li ser lawiran bi awayekî vekirî û kurt binivîsîn û hêmayên nivîsê li ber çavan bigirin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Destpêkê nivîsandina li jêr bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin. Paşê nivîsînê bi dest nivîs û xweşik li lênûsa xwe bi cih bikin. Nivîsina xwe bi nîgarî bixemilînin.**

Gimgimoka biçûk êdî pesnê hevalên xwe nedida û xwe ji hevalên xwe mezintir didît. Her kesî jê re digot: "Dema tû mezin bibî, dîsa tû yê her gimgimok bimînî û neyê guhertin." Lê gimgimokê digot: "Na! Ez tîmsahek im."

## BAJARÊ GORDÎAS, GORDÎON

Di demên kevin de li Başurê Rojavayê Enqerê mirovên jîr û bi çandiniyê ve xerik dibûn dijiyan. Van mirovan ji karên xwe yên çandiniyê berhemek baş derdixistin.

Demek hat di wê civakê de hinek tengasî destpêkir. Ji bo bajar, bi awayekî baş û rêxistî rêve bibin, biryara hilbijartina rêveberekî standin. Lê belê ne dizanîn ku wê hilbijartinê çawa bikin. Ji ber dibû ku di hilbijartina rêveberiyê de alozî derbikevin. Ji bo vê yekê nûnerên gel diçin cem Kohan ku rûspiyê herî mezin yê bajêr e û bi wî dişêwirin. Bersiva Kohan bi vî rengî bû: "Sibehê zû hêj ronî derneketî, yekemîn kesê bi hespê xwe bê qada bajêr, ew ê bibe rêveberê we." Roja piştî wê gel dikeve nava bendewar û çavnêriyê ka wê kî bibe rêveber.

Roja piştî wê, berbanga sibehê gundiyê bi navê Gordîas dikeve qada bajêr. Gel, Gordîas bi hezkirin, coş û xurûşek mezin pêşwazî dikin, wî weke rêveberê xwe diyar dikin. Tac danîn serserê wî û birin qesrê. Ji wê rojê û pê de navê wî bajarî kirin Gordîon.



Piştî Gordîas bû rêveber bi dewleserê axa Anatolê, ya bizax welatek dewlemend avadike. Zevî bi qevdên genimên zêrîn tijî dibin û Firigî jî tevlî sazûmaniya Anatoliyê dibin.
Gordîas, bi Kîbele ya ku xwedawenda xweza û bereketê ye re pevjîn dibe. Kurê Gordîas, Mîdas jî dibe cîgirê Gordîas.

***Ji Serpêhatiyên Anatoliyê***

## Wateyên Peyvan

**Alozî:** Nakokî, tevlihevî.
**Nûner:** Temsîl, pêşevan.
**Kohan:** Xeribzan, serhatî, pêşbîn.
**Firîgiya:** Navê şariştaniyek kevin
**Pevjîn:** Zewac

## Em Têbigihin

1- Gelê di mijarê de dabaşa wî tê kirin li kûderê û çawa jiyaye?
2- Gel, çima çûn gel Kohan?
3- Gordîas çawa bû rêveber?
4- Gel rêveberiya Gordîas çawa pêşwazî kir?
5- Gordîas ji bo gelê xwe çi kir?

## Destûrên Ziman

1- Di hevoka jêr de "*kirek*" û "*kar*" diyar bikin.

Gordîas dikeve qada bajêr.

***Kar**, peyva (**dikeve**) ku di hevokê de kirinê dide diyarkirin*.

**Kirek** (**Gordîas**) kesê di hevokê de kar kiriye.

2- Pêkir: Karê hevokê pêşwazî dike. Ji ber ku kar pê tê kirin, jê re **pêkir** tê gotin.

**Mînak**:

Gel **Gordîas** wek rêveber diyar kirin.

Di hevoka jor de peyva **"Gordîas"** ji ber ku karê hevokê pê hatiye kirin, **pêkir** e.

3- Di hevoka jêrî de peyva "**tengasî**" bikin pirjimar hevokê dubare binivîsin.

**Dema gel diket tengasiyê**.

Navbera wan herdû hevokan de çi cudahî heye? B0êjin.

Di nivîsîna we xwendî de, peyvên **"Gordîas, Kohan, Frigî û Kîbele"** bi dirustî li lênûsa xwe binivîsin. Wan peyvan bi alîkariya mamosteyê xwe bixwînin.

## HÎNDARÎ

1- Kurtiya vê mijarê binivîsin.

2- Di waneya zanistên civakî de, di derbarê Frigiya de hûn fêrî çi bûne? Wekheviya wan û ya we nivîsandî de çi ye?

3- Di derbarê Mîdas de tiştên hûn ji ansîklopoediyê fêrbûn ji hevalên xwe re bibêjin.

# WELATÊ ME

Kurdistan yek ji welatên Rojhilata Navîn e. Ev welat dikeve başurê rojavayê parzemîna Asyayê. Welatên cîranê Kurdistanê ev in; Tirkiye, Ermenistan, Gurcistan, Îran, Iraq û Sûriye.

Welatê me li bakur nêzîkî Derya Reş e. Li milê başûrê rojava nêzîkî Derya Spî ye. Li milê başûr jî nêzîkî Kendava Basrayê ye. Rûpîvana xaka Kurdistanê ji 550 000 $km^2$ (dame) derbas dibe. Hêjmara şêniyên wê ji 40-42 milyonî zêdetir e.



Welatê me bi giranî li ser zemîneke çiya ye. Lê herêmên deşt û berî jî hene. Hinek ji çiyayên Kurdistanê ev in: Zagros, Agirî, Şaho, Dalaho, Sîpan, Mûnzûr, Gare, Toros, Metîna, Çiyayê Kurmanc, Cûdî, Şengal, Qendîl û hwd. Ji deşt û beriyên wê jî mirov dikare çendekan bide. Mînak: Deşta Heranê, Beriya Mêrdînê, Beriya Nînowa, Deşta Hewlêrê, Deşta Amedê, Deşta Serdeştê, Deşta Efrînê û Deşta Sûricê. Herwiha cihê me, welatekî têrav û derav e. Gelek robarên weke Firat, Dîcle, Xabûr, Sîrwan, Roşîn, Ava Reş, Zê, Hêzil, Ares û herwekî din tê de diherikin. Golên mîna: Ûrmiye, Wan weke din yên dibin sedemê avdêrî û xweşîkbûna vî welatî hene.

Kurdistan di warê xwezayî û aborî de cihekî xweşdîmen û dewlemend e. Hebûna av, derav, deştên şîn û rengîn, çiyayên bilind û bi berf xweşî û renginiyekê didin vî welatî. Hebûna petrol û gelek cûreyên heyberên kanzayî dibin sedemê dewlemendiya vî welatî. Ev welat xwediyê çandiniyeke berfireh e. Di warê xwedîkirina lawiran de jî xwediyê risteke mezin e.

Di Kurdistanê de ji bilî Kurdan gelek netewên mîna Ereb, Ermen, Asûr, Suryanî, Turkmen jî hene. Ji bilî ola Îslamê (Şîa, Sunnî), Êzidî,Cihû û Xiristiyan jî di vî welatî de hene.



## Wateyên Peyvan

**Rojhilata Navîn:** Parzemînên Asya, Ewrûpa û Efrîqayê bi hev ve dide girêdan.

**Kendav:** Cihên ku ava deryayê di nava bejahiyê de dirêj dibe.

**Rûpîvan:** Firehiya xakê.

**Km² (Kîlometredam):** Pîvana serzemîna çargoşe.

**Serzemîn:** Sercih, serxak

## Em Têbigihin

1- Kurdistan li kûdera cîhanê cih digire?
2- Rûpîvana Kurdistanê û hêjmara şêniyên wê çend e?
3- Serzemîna Kurdistanê di aliyê erdnîgariyê de çawa ye?
4- Di Kurdistanê de kîjan netew dijîn?
5- Di kîjan aliyan de Kurdistan dewlemend e?

## Destûrên Ziman

1- Di hevoka jêr de kîjan peyvê, pêvaka pirjimariyê girtiye, diyar bikin.

**Di Kurdistanê de ji bilî Kurdan hinek netewên din jî hene.**

2- Di mijara we xwendî de, hûn dibînin tîpên "**hwd.**"ev kurte nivîsa peyvên "**her wekî din**" e. Kîlometre jî bi tîpên "**km**". hatine nivîsîn. Hûn jî mînakekî weke van li lênûsa xwe binivîsin.

## HÎNDARÎ

1- Tiştê hûn ji vê nivîsê fêrbûn bi çend rêzan binivîsin.
2- Girîngiya naskirina welat ji bo we çi ye lêkolîn bikin.

# KURDISTAN

Tev çiya û bax û bostan
Te dixemilînin Kurdistan

Tu warê bav û kalan î
Tu eşq, evîn û raman î

Roja mezin tîrêj da te
Heland berfa çiyayên te


Fantomê bombe barandin
Çiya û gund şewitandin

Şoreşgeran kirin xebat
Êdî dijmin nîn e tebat

Bihar nû hat çû zivistan
Te nahêlin li bin destan

Ava te xwîna şehîdan
Zindî kir ax û tev jiyan

Bi sond û peyman û hêvî
Ji dilê min dernakevî









## Wateyên Peyvan

**Fantom:** Cûreyek ji firokên şer.
**Raman:** Hizir, bîr û fikir
**Tebat:** Hedar, aram, hêmin
**Zindîkir:** Bigiyan kir
**Peyman:** Lihevkirin

## Em Têbigihin

1- Helbestvan çima ji welatê xwe re dibêje; Tu eşq, evîn û raman î?
2- Rêzika "Ava te xwîna şehîdan", tê çi wateyê?
3- Di malika sê de peyva “Roj” bi çi hatiye mînandin?

## Destûrên Ziman

1- Paşgira di peyva jêr de cuda binivîsin.
Kurd**istan**.
Paşgira **“stan”ê** her tim navê cih dide diyarkirin.
2- Di helbestê de navên taybet bi tîpên çawa hatine destpêkirin?

## HÎNDARÎ

1- Çi tişt Kurdistanê dixemilîne?
2- Çima çiya û gundên Kurdistanê tên şewitandin?
3- Em ji malika jêr çi têdigihîjin, di refê de goftûgo bikin?
**Roja mezin tîrêj da te**
**Heland berfa çiyayên te**
4- Rêber APO li Kurdistanê jiyaneke çawa afirand?
5- Tiştê ku ji dilê me qet dernakeve çi ye?

# TESTII.

## XWEŞBÎN

*Her dem di odeya pirtûkên xwe de, rojnameyeke pêkenokan hilînin. Dema hûn hinekî bêzar bûn, hema zû wê vekin û bixwînin. Di sînemayan de temaşekirina filmên pêkenok ji dest bernedin. Bibezin civatên kesên ku xweş daxivin, yariyan dikin û çîrokên seyr dibêjin. Li wan guhdarî bikin.*

***Bersiva her du pirsên destpêkê li gor mijara jor bidin.***

**1- Nivîskar dixwaze hûn kengê rojnameya pêkenokan bixwînin?**

**a)** Dema we li hemberî tiştekî nerazîbûn girt.
**b)** Dema hûn kêfxweş bûn.
**c)** Dema hûn bêzar bûn.
**d)** Dema hûn ji tiştekî tirsiyan.

**2- Nivîskar temaşekirina kijan fîlman pêşniyar dike?**

**a)** Fîlmên karton .
**b)** Rêzefîlm.
**c)** Fîlmên pêkenokan
**d)** Fîlmên xemgîn.

**3- Peyva "Ronahî"yê di kîjan hevokên jêr de, di wateyekî cuda de hatiye bikaranîn?**

**a)** Ronahiya findê kêm bûye.

**b**) Şoreşa Kurdistanê dibin ronahiya Rêber Apo de pêş dikeve.

**c)** Ronahî nebe, em derdora xwe nabînin.

**d)** Şevê din di demjimêr dehan de ronahî vemirî.

**4- "Ger tû bi vî rengî diravên xwe bimezêxî *wê biqede*."**

**Di vê hevokê de li cihê peyvên hatine nîşankirin mirov dikare ji peyvên jêr kîjanê binivîse?**

**a)** Wê zêde bibe.

**b)** Wê xira bibe.

**c)** Wê hew bibe.

**d)** Wê kom bibe.

**5- "Rojên min ên dibistanê bi kêf derbas bûn."**

**Dijwateya peyva "kêf"ê ya di hevokê de ji yên jêr kîjan e?**

**a)** Tirs

**b)** Xemgîn

**c)** Coş

**d)** Kîn

**6- Ji navên jêr kîjan navê dariştî ye?**

**a)** Gul
**b)** Gulbihar
**c)** Gamêş
**d)** Şoreşger

**7- Di vê hevoka jêr de kîjan peyv li şûna nav hatiye bikaranîn?**
"Gernas pirtûk daye wî."

**a)** Pirtûk
**b)** Wî
**c)** Gernas
**d)** Daye

**8- Kîjan ji peyvên li jêr çewt hatiye nivîsîn?**

**a)** Xûn
**b)** Qevd
**c)** Mizgîn
**d)** Awir

**9- Di hevokên jêr de, li dawiya kîjanê kar nehatiye nivîsîn?**

**a)**Tirampêl bi lez ber me re borî.
**b)** Rê ji peyan dagirtîbû.
**c)** Sibe ez ê biçim malê.
**d)** Zana ji çiyê hat.

**10- Kîjan ji peyvên li jêr pêvaka pirjimar li ser hatiye nivîsîn.**

**a)**Çiyayî
**b)** Mirovan
**c)** Biharê
**d)** Zozan

## BEŞA 4

# AZADÎ JI ZAROKATIYÊ DEST PÊ DIKE



Hêj niha jî tê bîra min, em li ber siha mizgeftê bûn. Kalekî serê xwe zivirand û got:

-Lawê min, em weke van darên hişk in, tu niha dikarî bidî şînkirin? Bîranîna destpêkê ye û hêj niha jî tê bîra min.

Sala 1984'ê hozanek hat cem min û gotineke min anî bîra min û got:

"Şînbûna gulê di zinarê de." Gotineke we ya wiha hebû.

Ango ez wekî gulekê di kevir de şînbûme. Ango ez ê bikarim bi vî rengî ser bikevim?

Şînkirina dareke hişk, wekî şînbûna gulekê di zinarekî de ye. "Azadî ji zarokatiyê dest pê dike." Ji ber ku zarok mîna kaxezeke spî ye, tû çi li ser binivîsî, dê ew bê xuyakirin. Ji ber vê min dixwest em tev bi hev re bi rê ve biçin. Di zarokatiyê de, tiştê herî ez kêfxweş dikirim; çêkirina komên zarokên biçûk û rêvebirina wan bû.

Ji bo ku ew lîstokên asayî yên em dizanin, pêk bînin; min hezar hêcet çêdikirin. Belê bi hev re, bi serê xwe lîstin nîn e. Min gelek lîstok derdixistin û ew tim di nav tevgerê de dihêlan. Min di zarokatiya xwe de têr nelîst, ji ber ku azadî nebû. Ya ku em dixwazin ne ceng e, lîstina zarokan e. Lîstokên sivik, li çiyan rêveçûn, komkirina pîvokan, giya dirûn û girtina firindeyan bû. Lê me pir kêm zarok danîn lîstinê, ji ber ku dê û bavên wan nedihiştin. Min digot:

"***Azadî ji zarokatiyê dest pê dike.***"

***Rêber APO***

## Wateyên Peyvan

**Asayî:** Tişta bi awayekî vehês tê kirin.
**Hêcet:** Sedem, tiştê ku tu dikî sedemê mijarekê.
**Ceng:** Şer
**Pîvok:** Giyayeke di mêrg û zozanan de, bi xwezayî şîn dibe û tê xwarin.
**Firinde:** Tebayên difirin, balinde.

## Em Têbigihin

1- Kalo çi ji Rêber Apo re got?
2- Hozan, kengî hatibû cem Rêber APO û çi anîbû bîra wî?
3- Di zarokatiyê de tiştê herî zêde Rêber APO kêfxweş dikir çi bû?
4- Rêber Apo, zarok mîna çi dihesibandin?

## Destûrên Ziman

1- Di hevoka jêr de pêveka tarî hatî nivîsandin pêveka çi ye?
"Min ew di tevgerê de dihêl**an**."
2- Di hevoka "Argeş ji Kobanê hat**.**" de kireka vê hevokê bidin diyarkirin.
3- Peyvên di hevoka jêr de cih digirin kîjan peyv dijî hev in?
"**Zarokên bi Rêber re dilîstin, hin jê mezintir û hin jî jêbiçûktir bûn**."
4- Di hevoka jêr de, bêhnok kîjan peyvan ji hev cuda dikin?
**"Di zarokatiyê de tişta herî ez kêfxweş dikirim çêkirina komên zarokên biçûk û rêvebirina wan bû."**

## HÎNDARÎ

1- Nivîsa we xwendî, bi kurtî vekin. Encama ku we ji vê nivîsê derxistî bidin diyarkirin.
2- Dê û bavên we, ji bo roja ji dayîkbûna Rêber Apo pîroz bikin,
amadekariyên xwe kirine?
Ji ber vê yekê ji malbatakê re vexwendinameyekê kurt û vekirî binivîsin. Di vexwendinameya we ji bo kê, kengî û li kûderê ye bidin diyarkirin.

## Mînaka Nivîsîna Vexwendinameyekê

***Vexwendiname***

***Birêz ……….***

***Rojbûna Rêber Apo di 4'ê Nîsanê de tê pîrozkirin. Di vê pîrozbahiyê de tevlîbûna we wê me dilşad bike.***

***Hêvidar im ku ev pîrozbahiya me wê we serbilind bike.***

***Cih:*** *Dibistana Seretayî ya Ş. Salih KANDAL*
***Mêjû:*** *04.04. 2014*
***Demjimêr:*** *08: 30*

# PÎREMÊRD

Pîremêrdê
Çuwe qutabxaney gundê
Le hewşekeda rawesta
Dewreyan lêda mamosta
Ha xale giyan
Çît gereke; ha xale giyan
Pîremerdî bestezeman
Ke lawaz bû weku goçan
Wotî: Tu xuwa mamosta gîyan
Fêrim nakey çon binûsim Kurdistan!



## Wateyên Peyvan

**Pîremêrd:** Helbestvanekî navdar yê Kurd
**Qutabxane:** Dibistan
**Xale giyan:** Xalo heyran.
**Goçan:** Gopal
**Bestezeman:** Hejar, belengaz.

**HELBEST BI KURMANCÎ**

# PÎREMÊRD

*Pîremêrî*
*Çûyî dibistana gund*

*Di hewşê de rawesta*

*Dewre dikir mamosta*

*Ha xalê can*

*Çi te divêt xalê can*

*Pîremêrê hejar*

*Ku lewaz bû weku gopal*

*Got: Tu xwedê kî mamosta can*

*Min fêr nakî çawa binivîsim Kurdistan!*

## MIJARA SERBEST

### ROJBÛN

Bihara ku di 4’ê Nîsanê de derketî, her kes dixwaze di rojên şahiyan de, vê biharê di nav nameya evîna xwe de bike diyarî.

Ji ber ku ev bihar bi xwîna şehîdên vî welatî hatiye avdan. Bi xwihdana eniya mêrxasan belk daye. Bêhna xwe ji birînên singa Egîdan girtiye. Xemla xwe ji xweşikbûna Zîlan û Semayan standiye. Êdî ev bihara di vê roja derketî de, ji bo her mirovekî dibe guleke geş; ji kêfxweşiya vê rojê hozan tembûrên xwe bi ziman dikin. Hevsengiya dengê xwe û tembora xwe çêdikin. Ji ber ku êdî wateya vê rojê ji bo wan tê têgihiştin û zimanê wan ji bo vê rojê tê vekirin. Ker bi guh dibin, lal bi ziman dibin, dîn şiyar dibin û ji ber ku êdî bi 4’ê Nîsanê ji firindeyan tenê firîn dibe para Kevoka Spî.

Sibat dibe Firewn, Nemrût û li ber bêhna biharê.



# BIHARA WELATÊ ME

Bihar, yekemîn werzê salê ye. Bayê biharê xweş û hênik e. Di biharê de gul û kulîlk dibişkivin. Giya şîn dibe. Cîhan dixemile. Firinde hêlînên xwe çêdikin. Zindî tev piştî derbasbûna sermaya zivistanê, jiyaneke xweş û nû dest pê dike.

Di biharê de, tevahî deverên Kurdistanê bi rengên kesk sor û zer dixemilin. Ji ber vê çendê bihar ala rengîn tîne bîra mirov.

Her çiqas başûrê Welatê me di nav bihareke rengîn de dijî lê hîna Bakurê welatê me dibin berfa dijwar de ye. Hêj gelê me yê wan herêman kulên sermaya zivistanê, ji bîr nekirine. Bandora xwezaya zivistanê ya li ser gelê me bi dawî nebûye. Bi gelemperî ji derveyî hin herêman tevahî zarok û kulîlkên welatê me bi xweşiya biharê şad dibin.

Piştî meheke din hinek herêmên welatê me, dê ji nû ve ji berfê rizgar bibin. Kulîlkên van herêman, dê ji bin keviyên berfê serê xwe rakin û bi ronahiya rojê şad bibin. Dîsa di hinek herêmên welatê me de, ji ber germahiya havînê, kulîlkên geş dê biçilmisin. Ji ber ku welatê me gelek werzan bi hev re dijî.



## Wateyên Peyvan

**Werz:** Demsal
**Kul:** Êş, elem, nexweşî
**Gelemperî:** Bi awayekî giştî
**Xweza:** Sirûşt tiştê bixwe heyî û bixwe çêdibe.

## Em Têbigihin

1- Nivîs li ser çi mijarê hatiye nivîsandin?
2- Di mijarê de kîjan herêmên welatê me tên ziman?
3- Bi hatina biharê re, çi guhertin di welatê me de çêdibin?
4- Di destpêkê de bihar di kîjan herêmên welatê me de, bi cih dibe?
5- Dema kulîlk ji bin berfê derdikevin bi çi şa dibin?

## Destûrên Ziman

**1**- Dî hevokên jêr de pêvekên pirjimariyê bidin diyarkirin.

*Balinde hêlînên xwe çêdikin*.

*Hê jî gelê me yê wan herêman kul û xemên sermaya zivistanê ji bîr nekirine*.

## HÎNDARÎ

1- Herî zêde hûn ji kîjan werzê salê hez dikin? Çima?
2- We çi wate ji vê mijarê derxist?
3- Ji bo nasekî xwe qerteke pîrozbahiyê binivîsin. Em vê qertê ji bo rojên rojbûn, xêlî (dawet), serkeftin, cejn û pîrozbahiya sersalan, ji nasekî xwe re dinivîsîn.

Pêwîst e, em kurt, ji dil û can binivîsin. Em dikarin qertên wêneyî jî bi kar bînin.

***Mînaka Qerta Pîrozbahiyê***

***Hevalê Hêja***

***Min agahî girtiye ku di pêşbirka zanîstî ya dibistanên seretayî de we pile standiye.***

***Ez bi dil û can we pîroz dikim û berdewamiya serkeftinê ji we re dixwazim.***

***Bêrîvan TOLHILDAN***
***08.05.2014***

# PÊKANÎNA SOZÊ


Zarokno! Nizanim bala we kişandiye? Gelek mirov nahizirin ku pêkanîna sozê ji bo mirovan girîng e. Cihê tê bangkirin, di dema xwe de nayên. Heta mirov dikare bêje, bi rastî û dirustî soza xwe bi cih nayînin.

Xwe ji vê hînbûna xirab biparêzin! Bixebitin ku hûn her tiştî di dema wê de bikin. Ger we sozek da kesekî, divê hûn bi cih bînin. Dema demjimêra ketina ref û dibistanê temam dibe, derî tê girtin. Xwendekarên dereng tên li derve dimînin. Bihizirin! Bi dehan xwendekaran berê xwe daye mamosteyê xwe guhdar û temaşe dikin. Di vê demê de xwendekarek teq, derî vedike û dikeve refê. Her wekî di mala xwe de ye dikene. Bi aweyekî laqirdî li ser mêzê xwe rûdine. Ev reftarek nebaş e.

Fermandarên mezin ne tenê fermanê didin. Her wiha kesên wê fermanê pêk tînin jî gav bi gav dişopînin. Fermana di dema xwe de neyê dayîn û pêkanîn carna dibe ku li şûna serkeftinê, binkeftinê bi xwe re bîne.

Zarokno! Karê we girtî li ser milê xwe di dema wê de pêk bînin. Karê îro ne ji bo sibê, ta ji bo bêhneke din jî nehêlin. Çawa hûn ji êşa zirav û penceşêrê xwe diparêzin, ewqas jî xwe ji xemsariyê biparêzin. Bizanin kesên karê xwe di dema kar de neke, wan riya binkeftinê bijartine.

Dema hûn li kesên di karê xwe de serkeftî temaşe dikin, dibînin her yek ji wan weke demjimêrê tev digerin. Sozê bidin xwe da ku hûn tevahî karê xwe di dema wê de pêk bînin. Piştre jî pêkanîna sozê deynekî giran e di stûyê we de ye. Vî tiştî ji bîr nekin.



## Wateyên Peyvan

**Fermandar:** Kesên ku fermanê didin
**Civîn:** Kombûn
**Penceşêr:** Qansêr, seretan
**Laqird:** Henek, tinaz, tirane

## Em Têbigihin

1- Nivîskar dibêje xwe ji vê hînbûna xirab biparêzin. Ev hînbûna xirab çi ye?
2- Çima pêwîst e, em di dema xwe de biçin dibistanê?
3- Dema em karê xwe, di dema wê de nekin, dibe ku rê li ber çi veke?
4- Di benda dawî ya nivîsê de dabaşa çi dike? Tişta di vê bendê de hatiye nivîsîn, mirov dikare bibêje sojeya mijarê ye? Çima?

## Destûrên Ziman

1- Di hevoka jêr de pêveka şûna yekê digire bidin diyarkirin.

Kesên tên bangkirin demjimêr**ek**, nîvdemjimêr dereng tên.

Ger we sozek da yekê, divê hûn bi cih bînin.

Dema em temaşeyî van hevokên li jor dikin, dibînîn ku pêveka "**ek**"yekjimariyê dide diyarkirin. Ji ber vê yekê pêwîstî nehatiye dîtin peyva "**yek**" bê nivîsîn.

**Têbînî**: Pêveka "**ek**" şûna yekê digire.

**Mînak:**

Yek demjimêr = demjimêr**ek**

Yek soz = soz**ek**

2- Di zimanê Kurdî de dema tîpa "**î**" dikeve pêşiya tîpa "**y**" tîpa "**î**"ya dengdirêj cihê xwe ji tîpa "**i**" ya dengkurt re dihêle.

**Mînak:**

kurs**î** = kurs**i**yê.

# GEŞTA LI PERAVÊN GOLA WANÊ



Di baxçeyê dibistanê de ref rêz bûn, piştî navxwendinê ketin rê. Piştî rêwîtiyeke kurt gihîştin ber perava Gola Wanê. Erê ew şînatî çi bû? Şînatî bi şînatiyan re bibû yek.
Kevirên parçe parçe yên di nav şînahiyê de, her yek bazekî tîne bîra mirov. Em neh-deh metran nêzîkî navenda golê bi cih bûn.
Mamoste Viyan:
-Zarokno! Kom bibin, hinekî guhdariya min bikin. Mamosteya we Koçerîn wê derdorê, bi we bide naskirin. Zarokên her du refan li dor mamoste kom bûn. Mamoste Koçerîn ev tişt gotin:
- Zarokno! Ji vê derê re dibêjin newala Duquba. Ev hêşînahiya bêdawî ya hûn dibînin, Gola Wanê ye.
Evîn, mafê axaftinê digire û dibêje:
- Mamosteya min, hê jî Egîd dibêje derya ye.

- Ma dibe Egîd? Derya, ji vê pehntir û bi avên ji xwe mezintir re dibin yek. Li milê din Gola Wanê ji asta deryayê 1640 metre bilindtir e. Lê belê tevayî deryayên li ser rûyê cîhanê ku hene, di heman pîleya bilindbûnê de ne. Ava tevayî deryayan şor e lê Gola Wanê hem şor e hem bi soda ye.

Rojhat:

- Mamosteya min, ma Gola Wanê ne gola me ya herî mezin e?

Mamoste Koçerîn:

- Na, gola me ya herî mezin Gola Ûrmiyê ye. Peravê Gola Wanê bihuşta bakurê welatê me ye. Dirêjahiya perava wê her kesî dikişîne ber bi vê xweşikbûnê.

Piştî van agahiyan lîstok hatin lîstin. Bi hev re xwarin xwarin. Li pey wê dîsa dest bi lîstokan kirin. Ji xwe re stran û çîrok gotin. Hêdî hêdî demjimêra zivirînê hatibû. Dengê mamoste Viyan hat bihîstin.

- Zarokno! Ji bo zivirînê amade bin. Bi avabûna rojê re zivirîn çêbû. Dema di taxan de ronahiya hin malan pê diket zarok jî dizivirîn malê.



## Wateyên Peyvan

**Perav:** Berav,Ji qiraxên avên robar, gol û ji deryayan re tê gotin.

**Şîn:** Rengê golê

**Qub:**Aqid- azinc.

**Soda:** Heybereke ji bo paqijkirinê. Sodyom karbonat.

## Em Têbigihin

1- Mamoste xwendekar birin kûderê?
2- Cudahiya di navbera Gola Wanê û deryayan de çi ye?
3- Di nivîsê de peravên Gola Wanê çawa dide naskirin?
4- Zarokan di geştê de çawa şahî dikirin?

## Destûrên Ziman

Di hevoka jêr de peyvên ku tarî hatine nivîsandin, çi tişta heyînan dide diyarkirin?

Zarokên her **du** refan li dor mamoste kom bûn.

Derya li milekê ji vê pehntir e, li milê din bi avên ji xwe **mezintir** re dibin yek.

Peyva "**du**" jimara ref, peyva "**mezintir**" çawabûna avê dide diyarkirin.

## HÎNDARÎ

Nivîsa we xwendî bi kurtahî vekin. Di derbarê golê de tiştê hûn ji nivîsê hîn bûne li lênûsa xwe binivîsin.

Di geştên we kirî de bûyereke bi we xweş hatî binivîsin.

# AZADÎ

Dibêjin di rojên kevin de bazirganek hebû. Tûtiyeke wî bazirganî hebû. Tûtiyê bazirgan tim û tim jiyana xwe di rikehê de derbas dikir û gelekî ji vê jiyana girtî dilêş û tengav bûbû. Rojekê bazirgan ji bo karê bazirganiyê berê xwe da bajarê Ûrmiyê. Ji zarokên xwe re got:

- Ka we çi divê, ez ji we re bînim?

Her yekê tiştek xwest. Piştre bazirgan çû ber rikeha tûtî û got:

- Wa tûtiya delal! Ez ê biçim rêwîtiya Ûrmiyê, ka daxwaza te çi ye?

Tûtî:

-Ger te di rêya xwe de tûtiyên hevalên min dîtin, silavên min bigihîne wan û rewşa jiyana min ji wan re bêje.

Bazirgan:

- Baş e.

Bazirgan bi rê ket, di rêwîtiya xwe de, di daristaneke mezin re dibore. Ji nişkan ve çavên wî bi refeke tûtiyan ket û li ser çîmeneke rengîn awaz dixwendin. Daxwaza tûtî hat bîra bazirgan. Bazirgan ber bi refa tûtiyan ve çû silav kir û got:

- Ka pêşengê we kî ye?

Di nav tûtiyan de yek derket û got:

Ez im, pêşengê refê.

Bazirgan serboriya tûtiya xwe ya di rikehê de ji wî re got. Pêşengê tûtiyan di heman demê de xwe li xakê da û bû tayek dar. Te digot qey ev salek e, miriye. Bazirgan, gelek bi vê bûyerê êşa û rêya xwe girt û çû.

Piştî ku bazirgan karê xwe pêk anî û zivirî malê ji bo her zarokên xwe diyariyek anîbû, bazirgan çû dîtina tûtî. Tûtî jê pirsî ka te ji min re çi aniye?



Bazirgan serê xwe tewand. Nexwest ew bûyera ku dîtî ji tûtî re bibêje. Lê ji ber daxwaza tûtî bazirgan got:

- Rewşa min û pêşengê tûtiyan ev e.

Dema tûtî axaftina bazirgan bihîst, wî jî hema xwe li erdê da û xwe mirand. Hingî bazirgan pê re axivî, ka rabe tu çima wisa dikî? Lê bê sûd bû. Bazirgan di dilê xwe de got:

Diyar e ji qehra hevalên xwe miriye. Rabû tûtî ji rikehê derxist û bir danî nav baxçê malê. Çawa tûtî xwe ji derve dît, ji nişkan ve rabû ser xwe çû ser darê û got:

- Bazirgan, te baştirîn xelat ji min re anî, ew xelat jî azadiya min ya ji rikehê bû.

## Wateyên Peyvan

**Tûtî:** Firindeyek e ku dipeyîve.
**Awaz:** Stran, dengê xweş

## Em Têbigihin

1- Bazirgan diçû kûderê bazirganiyê?
2- Bazirgan ji zarokên xwe re çi anî?
3- Çima tûtiya di rikehê de xwe mirand?
4- Encama  mirov ji vê çîrokê bigire çi ye?

## Destûrên Ziman

Di hevoka jêr de cihê bêhnok kêm lê hatiye danîn, bêhnokan bi cih bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

**Bazirgan te baştirîn xelat ji min re anî ew xelat jî azadiya min ya ji rikehê bû.**

# DEHLA ME



Xwesteka min ya herî mezin çûna dehlê û hinekî ji malê dûrketin bû. Di wê demê de li ser serê min esmaneke bêdawî, di bin lingê min de axeke fireh wê hebûya. Min ê çiq bişkandana ax bikolaba, lîstok bilîsta, tîr bavêta, bi qoskê ber bavêtana. Li gor daxwaza xwe ez ê bibezîma. Min ê xwe hilavêta û dabûya ber qîran. Li wê derê ez ê bibûma zarokek paqij û azad.

Di nav dehla me de malek hebû. Odeyeke wê temam nebibû. Ji ber ku bavê min nexweş bû, bi me re nedihat nav dehlê. Ez, birayê min ê mezin, bapîr û Sisto diçûn dehlê. Sisto navê kerê me bû. Kerekî weke berxik birêz û weke seyekî dost bû.

Yekcar nedibezî. Ji ber vê yekê me navê wî kiribû Sisto. Leq û pehîn nedidan. Kêmasiyeke wî hebû, ew jî zêde diziriya. Dehla me li qûntara çiyayê Cûdî bû. Li pêşiya xanî dîwarek, li ser dîwar dareke berû hem tayeke tawî jî hebû. Li pişt wan daran hawîrdor bi darên hêjîran hatibûn girtin. Dehla me pir fireh bû. Li milê çepê yê koxê Sisto û li pêşberî koxê bîrek hebû.



Tevahî bêzûrên malê li vê derê digihîştin. Di kenarê riya di nav dehlê re derbas dibû de; genmok, nok û bacan tên çandin. Derketina ser dara tawî tirsnak bû. Mêşan dê bi mirov ve bida.

Me xweşiya firîkên nokan û şoqilan weke kêvroşkan baş zanîbû. Dema ku tirî hîn qorix bû, jêkirina wî qedexe bû. Piştî gihandina tiriyê ku me jê mewîj çêdikirin, me berîkên xwe ji mewîjên bêsîsik dadigirtin û xweşiya bê dawî bû.

## Wateyên Peyvan

**Firîk:** Dema zadên bi lib ku beriya hişk bibe jê re tê gotin.
**Qorix:** hersim- tiriyê tirş yê çênebûyî**.**
**Qusk:** Çetel
**Leq:** Gezên lawirên gewre.
**Şokul:** Boqil, baqil

## Em Têbigihin

1- Nivîskar dema zarok bû çima dixwest biçe nav dehlê?
2- Nivîskar bi kê re diçû nav dehlê?
3- Lawirê ku bi xwe re dibir nav dehlê, taybetmendiyên wî çawa bûn?
4- Benda dehlê dide naskirin kîjan e?
5- Nivîskar bi kîjan fêkiyên dehlê ve girêdayî bû?

## Destûrên Ziman

*1- Ew tîpên ku du dengên xwe heyî, ji wan re tîpên **cêwî** dibêjîn.*

**Tîpên cêwî ev in; "Ç, K, P, R, T"**

2- Tîpên dengdêrên kurt û dirêj ên di hevoka jêr de li lênûsa xwe binivîsin.

***Li wê derê ez ê bibûma zarokeke azad û paqij.***

3- Di zimanê Kurdî de **pênc tîpên dengdêrên dengdirêj** û **sê tîpên dengdêrên dengkurt** hene.

Tîpên dengdirêj: "**a, ê, î, o, û**"
Tîpên dengkurt: "**e, i, u**"

# SELEMÊŞ

Bû sîqîna deriyê dar û vebû. Bavê min bi lez û bez hat. Rûyê wî bi xwuhan bû; gelo ji nav zeviya bi dar, bi vê dasa sincirî ve çima hatibû?

Beriya ku em jê bipirsîn, ji min re got:

- Bi lez! Selemêşa li cem kûwarê bîne. Baqek nefel jî ji bîr neke.

Di cih de ez bezîm, dema me li tengezariya bavê xwe dinêrî, me digot:

- Roja em li hêviyê hatiye.

Dema min xwe amade kir û ez hatim binê daran, dayîka min kenî û dara tûyê nîşan da.

- Binêre Egîdê min; Çûka bihuştê hat, nesibê me hat ber derê me!



Çiqê mêşa hingîvîn pê ve tewa bû. Hê jî libên mêşan li hewayê dizivirîn. Di bêdengiya geştê de awaza wan bi nav û deng bû. Gulmika şilxê bi awayekî zindî hevdu girtibûn. Bi wan pêlikên xwe yên kurt û tenik ve, li ber tavê direcifîn. Selemêşa şerbeta şekir û nefel lê hatiye kirin, me hêdîka nêzîkî şilxê kir. Dema dayîka min çiq hejand, mêş ket nav selemêşê û me selemêş li binê darê bi cih kir. Me serê wê bi giya girt.

Rûyê bavê min yê bi xwuhdan bi xweşî vedibû.

- Selemêş nîvî bû. Ez bawer dikim şilxa destpêkê ye. Dibêjin şilxa destpêkê bi hêz e.

Serê xwe bi aliyê Mêhrê ve zivirand. Belê ji vî milî ve weke ewreke biçûk derketin û hatin. Dara me ya tûyê hilbijartin. Niha mêşek ya me heye. Bavê min bi destên xwe yê nerm danî ser serê min û got:

- Ev mêşa te ye lawê min; divê tu çavê xwe vekî û baş lê xwedî derkevî.

Mêşvanî karekî zanînê dixwaze. Temaşe bike sê beş mêşên hingivîn hene. Mêşên dayîk, mêşên nêr, mêşên karker. Bi rastî yên kar dikin mêşên karker in. Mêş zû digihin û zû zêde dibin.

Piştre me cihê selemêşa xwe li ber diwarê xaniyê xwe yê li milê başûr çêkir. Ez gelek dilşad bûm. Êdî selemêşeke min jî hebû.

## Wateyên Peyvan

**Selemêş:** Cihên mêş tê de tên bicihkirin.

**Nefel:** Navê giyayekî.

**Mêhrê:** Navê gundek yê Botanê ye. Hingiviyên wan bi nav û deng in.

**Şilx:** Mêşên bi aweyekî kom ji dayîka xwe cuda dibin.

Kûwar: Tiştên bi heriyê jibo hilanîna genim tê çêkirin.

## Em Têbigihin

1- Şilx li ku derê kom bûbûn?
2- Kê şilx xist selemêşê?
3- Ji bo şilxê bixin selemêşê, bi rêzê ve çi hat kirin?
4- Bavê wî di derbarê mêşan de, çi agahî da wî?
5- Selemêş li kûderê bi cih bû?

## Destûrên Ziman

1- Di hevokên jêr de navên pirjimar yên bi rengê tarî hatine nivîsîn, bi awayê yekjimar li lênûsa xwe binivîsin.

- Ez hatim binê dar**an**.
- Bi tastî yên kar dikin karker**in**.

2- Peyvên di hevokên jêr de bi awayê tarî hatine nivîsîn kîjan hatiye herikandin û kîjan jî hevgirtî ye.

**Serê** xwe bi aliyê Mêhrê ve zivirand.

**Selemêş** nîvî bû. Ez bawer dikim şilxa destpêkê ye.

Endamên hevoka jêr diyar bikin (kirek, pêkir, kar).

Tu çavên xwe veke.

## HÎNDARÎ

Ji dapîr û bapîrê xwe di derbarê jiyana mêşan û tiştên mêş çêdikin de pirsan bikin. Bersiva dapîr û bapîrê xwe rast binivîsin.

# EVÎNDARA MEZIN



Tu rêwi yî ez bênav
Li min kiriye silav
Awirên te yên dijwar
Dilê min kir tarûmar

Ax Cûdiyê mirada
Gemî ji me re rada
Çima te serî bada
Tu yî dermanê derda



Gulên sor yên baxê te
Agrî, Sîpan bejna te
Çem, robar keziyên te
Dil ketime xemla te



## Wateyên Peyvan

**Awir:** Mêzekirin.
**Tarûmar:** Belawela.
**Mirad:** Xwestek, daxwaz
**Radan:** Dançêkirin.

## Em Têbigihin

1- Di malika yekem de mirov çi têdigihe?
2- Sojeya helbestê ya bingehîn çi ye?
3- Helbestvan çi wateyê ji 'keziyê' digire?

## Destûrên Ziman

1- Di hevokên jêr de, pêvekên li dawiya navan kêm hatine nivîsîn temam bikin û cihê vala dagirin.

Agr... Sîpan bejna te
Ax Cudi..... mirada
Gul.... sorê baxê te

2- Hevoka jêr li lênûsa xwe binivîsin, navên di rewşa xwerû de binê wan xêz bikin.

Gemî ji me re rada.

## HÎNDARÎ

Eger di derbarê têgihiştinên helbesta we xwendî de hûn wêneyekî çêbikin, wê wêneyekî çawa çêbibe? Wêneyê ku hûn dihizirin vekin.

# ŞÊWAZA AXAFTINÊ

Rojekê dayîka Şêrzad gazî kirê û got:


- Berxê min were em ji xwe re, hinekî baxivîn.

Piştre wiha dest pê kir:

- Lawê min dema ku di dîwanekê de, tû dirûnî, kêm bibêje, gelek guhdarî bike. Eger te xwest ku baxivî, axaftina kesekî nebire. Xwe bigire heta axaftin hew bibe û dora bigehe te. Piştre baxive. Ji ber ku bi vî rengî her kes dê guhdariya te bike. Dê bizanin ka te çi got û tû jî wê bizanî tû çi dibêjî. Axaftina xwe gelek dirêj neke. Ji ber kesê ku zêde baxive, wê zêde jî şaşiyan bike. Di axaftina xwe de lezê neke û hêdî hêdî baxive. Wisa şîrîn û xweş baxive da ku bandorê li ser guhdarên te bike.

- Lawê min dema yek bi te re daxive, hiş û guhê xwe bide ser axaftina wî/ê. Xwe bi tiştên din ve xerîk neke. Ji ber ku baş axaftin û baş guhdarîkirin, nîşana perwerdekirineke baş û pêşketî ye.

Bi vî awayî dayîka Şêrzad dawî li amojgariyên xwe anî.



## Wateyên Peyvan

**Amojgarî:** Şîret

## Em Têbigihin

1- Çima dayikê gazî lawê xwe kir?
2- Axaftina baş çawa ye?
3- Mirov bi axaftinên çawa dikare bandora xwe li ser civakê çêbike?

## Destûrên Ziman

1-Hûn di waneya borî de fêrî tîpên cêwî bûbûn.

Tîpên cêwî (dudeng) evin;**"ç,k,p,r,t"**

Lê binêrin ev tîpên cêwî çawa bi du awayan deng derdixin.

| ***Awayê nerm*** | | ***Awayê hişk*** | |
|---|---|---|---|
| Çal | Çêlî | Çal | Çeltik |
| Pir | pêlav | Pez | poz |
| Ar | Ard | Rê | rejî |
| Tîr | tiving | Têr | Tûr |
| Kew | Kerî | Kurk | kurik |

## HÎNDARÎ

Hûn ê di betlaneya havînê de çi bikin? Ji hevalên xwe re vekin.

# HÊVIYA BARANÊ

Hindik mabû ku şînatî kulîlkên xwe vekin. Lê mixabin ev çend roj in, barana dihat hêvîkirin, nehatibû. Pel ji têhna çilmisîbûn. Hinek pelên jêr rûyê wan zer bûbûn. Ev xirab bû, hem jî pir xira bû. Dilxweşiya gundê me, biharek têr baran dest pê dike û havînek bêbaran dawî lê tê.



Rojek ji rojan, li gor daxwazên me çêbû. Ji milê Girê Êlim ve ewrekî reş, giran giran, hêdî hêdî, derket. Pir derbas nebû tevahî rûyê ezman girt û ji ewran çarçev çêbû. Li hewa vedana birûskan dest pê kir. Bapîrê min li cihê xwe diçû û dihat. Tim li milê Girê Êlim temaşe dikir.

Spas serdarê Egîd spas! Wê bibare. Hem jî wê baş bibare.

Tevahî gundî ketibûn nav lez û bezekê cilên ku li derve raxistî bûn kom dikirin. Pisîk direviyan malan, nêzîkî derî radiwestiyan. Ketina dilopan li ser axê dest pê kir. Dilxweşiya bapîrê min hêjayî dîtinê bû. Li derve nêrî û got:

-Ox, ox, ox...! Ev çi dengekî xweş e. Guhdarî bike Serdar Egîd, guhdarî bike. Ev deng mîna kîjan dengî ye, bêje. Dimîne dengê zêrîn. Ji nav tiliyên mirovan derdikeve. Ox,ox, ox....!


-Dibare. Pîroz pîroz dibare. Xakê weke havênê hevîr dipilpişîne. Rayên giyayên çandiniyê di bin xakê de asê dike.

Serdar Egîd:

-Bapîr, zeviya me ya li milê Girê Êlim pir baran standiye. Bila bibare. Herî zêde li zeviya me bibare.

Bapîr:

-Hewar! Bêdeng be. Serdar Egîd bêdeng bin. Ma bes zikê me tenê birçî dibe. Careke din wisa nebêje. Bi vî awayî hizirîn ezezî ye.



## Wateyên Peyvan

**Havên:** hevîr tirş

**Êlim:** Gireke di navbera navçeyên Cizîr û Niseybînê de ye.

**Ezezî:** Kesê ku tenê li xwe difikire.

## Em Têbigihin

1- Bûyer di kîjan demsalê de derbas dibe?
2- Gundiyan çima barîna baranê pir dixwest?
3- Berî ku baran bibare li ezman çi guhertin çêbû?
4- Bapîr dengê çi mîna dengê zêr didît?
5- Bapîr kîjan hizirîna Serdarê Egîd weke ezezî dinirxîne?

## Destûrên Ziman

1- Hevokên li jêr li lênûsa xwe binivîsin. Di hevokan de binê peyvên kirin û bûyerekê didin diyarkirin xêz bikin.

-Cilên li derve raxistî kom dikirin.
-Pisîk direviyan malan.
-Tevayî gundî ketibûn nav lezûbezekê.

*Di hevokê de, peyva ku kirina karekî dide diyarkirin, em jê re dibêjin* ***kar.***

2- Di nivîsê de çend sererêz hene? Li gorî vê çend bend hene?
3- Di nivîsê de peyvên di hevokê de, bi tîpa gir hatine destpêkirin navên taybet in. Van navên taybet li lênûsa xwe binivîsin.
4- Hevokên li dawiya wan baneşan hatiye danîn çi didin diyarkirin?

## HÎNDARÎ

1- Çi sûd û ziyana baranê heye, li lênûsa xwe binivîsin û ji hevalên xwe re vebêjin.
2- Di rojeke baranê de, tiştê we dîtî bi nivîsekê vekin.
3- Bixebitin ku hûn vê mijarê li gor hest û hizirîna Serdar Egîd û bapîrê wî bi awayekî herî baş dide diyarkirin, bixwînin.
4- Kesên ku dixwînin bi baldarî guhdarî bikin, yê ku baş dixwîne ji xwe re mînak bigirin.

# TEST III.

***AZADÎ JI ZAROKATIYÊ DEST PÊ DIKE***

*"Şînkirina dareke hişk, wekî şînbûna guleke di zinarinekê de ye . "Azadî ji zarokatiyê dest pê dike." Ji ber ku zarok mîna kaxezeke spî ye, tû çi li ser binivîsî, dê ew bê xuyakirin. Ji ber vê min dixwest em tev bi hev re bi rê ve biçin. Di zarokatiyê de, tiştê herî ez kêfxweş dikirim; çêkirina komên zarokên biçûk û rêvebirina wan bû.*

*Ji bo ku ew lîstokên asayî yên em dizanin, pêk bînin; min hezar hêcet çêdikirin. Belê bi hev re, bi serê xwe lîstin nîn e. Min gelek lîstok derdixistin û ew tim di nav tevgerê de dihêlan. Min di zarokatiya xwe de têr nelîst, ji ber ku azadî nebû. Ya ku em dixwazin ne ceng e, lîstina zarokan e. Lîstokên sivik, li çiyan rêveçûn, komkirina pîvokan, giyadirûn û girtina firindeyan bû. Lê me pir kêm zarok danîn lîstinê, ji ber ku dê û bavên wan nedihiştin."*

***Her sê pirsên destpêkê, li gorî mijara jor bersîv bidin.***

**1- Li gor mijarê şînkirina darekê hişk wekî çi ye?**

**a)** Wekî şînbûna guleke di zinarekê de ye.
**b)** Wekî avdana wê darê ye.
**c)** Wekî çandina darê ji nû ve ye.
**d)** Wekî şewitandina darê ye.

**2- Li gor mijarê, azadî ji kengî dest pê dike?**

**a)** Ji şoreşê dest pê dike.
**b)** Ji xwendinê dest pê dike.
**c)** Ji zarokatiyê dest pê dike.
**d)** Ji li hevhatinê dest pê dike.

**3- Çima Rêbertî di zarokatiya xwe de têr neleyîstiye?**

**a)** Ji ber leyîstok nebûn.
**b)** Ji ber zarokên ku pêre bileyîze nebûn.
**c)** Ji ber ku ji leyîstokan hez nedikir.
**d)** Ji ber ku azadî nebû.

**4- Kîjan peyva di hevoka jêr de kirek e?**

**"Hogir di hola dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn de bi goga hevalê xwe dileyîze."**

**a)** Dibistan
**b)** Gog
**c)** Amadeyî
**d)** Hogir

**5- Ji pêvekên jêr kîjan pêveka pirjimariyê ye?**

**a)** Geh
**b)** Dank
**c)** an
**d)** Î

**6- Di kîjan hevoka jêr de pêveka yekjimariyê hatiye bikaranîn?**

**a)** Karwan çû gel hevalê xwe.
**b)** Em ê her yek pênûsekê ji xwe re bikirin.
**c)** Dibistana me pir xweş e.
**d)** Mamoste waneyê xweş vedike.

**7- Di kîjan rewşê de tîpa 'î' cihê xwe ji tîpa 'i' re dihêle?**

**a)** Dema bi hev re hatin.
**b)** Dema tîpa 'î' piştî tîpa 'y' tê.
**c)** Dema tîpa 'î' li pêşiya tîpa 'y' tê.
**d)** Dema tîpa 'î' bi armanca pêvekê tê karanîn.

**8- Kîjan rêzkirina li jêr ji bo tîpên cêwî tê bikaranîn?**

**a)** P R T Ç K
**b)** T Ç K P R
**c)** Ç K P R T
**d)** K R T Ç P

**9- Di Kurdî de çend tîpên dengdêrên dengdirêj û çend tîpên dengdêrên dengkurt hene?**

**a)** Pênc dengdirêj sê dengkurt
**b)** Çar dengdirêj çar dengkurt
**c)** Sê dengkurt pênc dengdirêj
**d)** Şeş dengkurt du dengdirêj

**10- Di hevokê de peyva ku kirina karekê dide diyarkirin, em jê re dibêjin çi?**

**a)** Pêkir
**b)** Kirek
**c)** Kar
**d)** Hevalkar



Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Nahcevan
Tirkiye
KURDISTAN
Iran
Suriye
Iraq
Derya Sipi
Lubnan
Idir
Qers
Sewas
Erzerom
Bazid
Agri
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Behra Wane
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Basqale
Firat
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Urmiye
Zaxo
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Cizir
Nexede
Qamislo
Dicle
Dihok
Mihabad
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam